

12

"مێژووی یەکێتی
بەشێک نییە لە مێژووی
بزووتنەوەی گۆڕان"

Termên 730 ***Enfalkiriyan*** *gihiştin Kurdistanê*

» 3

Hejmar / Nr. 149
31 Gulan / Mai 2012

ROJNAMEYA KURDÊN DIYASPORA

Rûdaw

ÇAPA EWROPA

Deutschland 1,50 Euro | Österreich 1,50 | Belgium 1,50 Euro | Danmark 15,00 DKK | France 1,50 Euro | Nederland 1,80 Euro | Norway 15 NOK | Schweiz 2,70 CHF | Sverige 21,00 SEK

ÎDIAYA HOVÎTIYEK NÛ:

Li girtîgeha Îzmîrê jinên kurd tên tazîkirin

4 »

Kupon 149

Sefereke bê pere bo Kurdistanê

5 rojnameyan bikire û bilêtekê qezenc bike

Nav û navnîşana we:..

Telefona we:..

5 kuponên ji hejmarên cûda yên Rûdawê bibire û ji vê navnîşanê re bişîne:

Rûdaw Media GmbH
- Tîrûpişk -
Gutenbergstr 63 a
50823 Köln
Almanya

Nav, navnîşan û telefona xwe ji bîr nekin

Bi sponsoriya **City Tower (Hewlêr)**

"Teror bi çekan bi dawî nabe, bi axaftinê çareser dibe"

» 11/12

Wêne: Rûdaw

Nûçe, raport û hevpeyvînên taybet. Herroj, 24 saetan.

Rûdaw.net

www.rudaw.eu
info@rudaw.eu

www.arsivakurd.org

Penaberê kurd (milê çepê) ligel parêzerê xwe serdana parlementerê japonî Ryoichi Hattori (milê rastê) kirin

Tirkiye li Japonê jî li pêşiya Kurdan kelem e

Rûdaw – Penaberekî kurd yê ji Bakurê Kurdistanê, ku ji tirsa ewlekariya xwe û malbata xwe naxwaze navê wî bê eşkerekirin, hewl dide hikûmeta Japonê razî bike ku wî jî wek hevjîn û çar zarokên wî dersînorî Tirkiyeyê neke û ragihand eger ku ji Japonê bê dersînorkirin, jiyana wî dikeve metirsiyê.

Li gor raporeke rojnameya Japan Times a japonî, ev bû çar caran ku serlêdana mafê penaberiyê ya wî penaberê kurd yê 42 salî ji aliyê hikûmeta Japonê tê redkirin û mafê wî yê karkirin û çavdêriya saxlemiyê jî tine. Penaberê kurd tevlî hevjîna xwe di sala 1999ê de ji Bakurê Kurdistanê reviyabû Japonê. Lê piştî karesata tsûnamiyê û qezaya nukleyerî li Fukoşîmaya Japonê sala borî, penaberê kurd ji ber tirsa ji tenduristiya hevjîn û zarokên xwe mecbûr razî bû ku ew bo Tirkiyeyê bên paşve şandin, lê ew li Japonê ma.

Ev penaber naxwaze wek hevjîn û zarokên xwe ji bo Tirkiyeyê bê paşveşandin û ji dadgehê re ragihandiye eger wî vegerînin Tirkiyeyê, hikûmeta Tirkiyeyê wî digire, ji ber ku ew tê tometbarkirin ku pêwendiyên wî ligel PKKê hebûne.

Di van salên dawî de sîstema wergirtina penaberan ji aliyê hikûmeta Japonê pirr tund bûye û par dora 3 hezar daxwazên wergirtina mafê penaberiyê pêşkêşî dadgehên japonî hatin kirin, lê tenê daxwazên 21 kesan hatin pejirandin. Li gor statîstîkên Wezareta Dadê ya Japonê, di hundirê sê salên borî de tenê 36 penaberên ji Tirkiyeyê mafê penaberiyê wergirtiye, lê di nav wan de Kurdek jî tine bûye.

Penaberê kurd wekî şansekî dawî niha di nav hewldana de ye ku piştgiriya parlementerekî japonî bi navê Rayochi Hatori bidest ve bîne, daku piştgiriya doza wî bike û Japon mafê penaberiyê bide wî û malbata wî. Lê Hatori daxuyand ku pirr zehmet e ku ew penaber mafê penaberiyê li Japonê wergire, "ji ber wê pêwendiya bihêz ku di navbera hikûmeta Japon û Tirkiyeyê de heye."

Kampanya Mohamed eleqeyek mezin dibîne…

…*18.000 €* gihiştine hev

Mohamed Qubat ji dema jidayîkbûna xwe ve ji ber nexweşiya dil li ber xwe dide

Köln (Rûdaw) - Kampanya alîkariyê ya ji bo Mohamedê 10-salî, yê ku niha tevlî malbata xwe li kampeke penaberan li Başûrê Kurdistanê dijî, eleqeyek mezin dibîne û di navbera 2 heftiyan de bêtirî 18.000 Euro gihiştine hev.

Mohamedê ku ji roja jidayîkbûna xwe ve ji dilê xwe nexweş e, li Kurdistanê nikare were emeliyatkirin û pizîşk çareserkirina nexweşiya wî tenê li derveyî Kurdistanê dibînin. Ji ber rewşa aborî ya xirab, malbata Mohamed ninake wî bişîne derveyî Kurdistanê, daku bê emeliyatkirin û tedawîkirin. Ji ber vê yekê beriya du heftiyan kampanyeke alîkariyê li Almanyayê ji bo xilaskirina Mohamedê biçûk hat destpêkirin û li gor agahiyên ji koordînatora kampanyayê, Jomana Djoumma, heta pêncşema borî (24.05.2012) 18.000 Euro alîkarî gihiştibûn kontoyên nexweşxaneya bajarê Bonnê ku Mohamed wê lê bê emeliyatkirin. Jomana Djoumma ji Rûdawê re diyar kir ku zêdiyî hêviya wan kampanyayê eleqe dîtiye û her ku diçe hejmara xêrxwazên ku alîkariyê dikin zêde dibe: "Ji gellek welatan alîkarî tê ser kontoyên nexweşxaneyê. Herçiqasî Kurd gellekî fedekar in, lê bi rastî em destpêkê bi guman bûn û gellek kesan digot ku Kurd wê li kampanyayê xwedî denekevin. Lê em dibînin ku kampanyayê bandorek mezin kiriye û vê yekê motîvasyona me hîn zêdetir kiriye ku em heta emeliyatkirin û başbûna Mohamed karê xwe hîn xurttir bidomînin."

Tê çarerêkirin ku Mohamed di 12ê Hezîranê 2012 de bo Almanyayê bê şandin û ewê derdorê 6 heftiyan li nexweşxaneya bajarê Bonnê bê tedawîkirin. Jomana niha ji bo çareserkirina pirsgirekên dawî yên burokratîk bi konsolxaneya almanî li Hewlêrê di pêwendiyan de ye û bi hêvî ye ku ew 12.000 Euroyên mayî jî heta hatine Mohamed bigihin hev. Di vê navberê de hunermendê kurd Mehmet Atli jî ji Bakurê Kurdistanê destê alîkariyê dirêj kiriye û amadebûna xwe ji bo lidarxistina konserteke alîkariyê li zaningeha Merdînê nîşan daye.

Hemû agahiyên derbarê kampanya Mohamed de û hesabên alîkariyê di hejmara Rûdawê ya 147ê de hatine belavkirin, anjî li ser malpera alîkariyê bo Mohamed li ser facebookê **(NEHÊLIN MOHAMED QUBAT BIMIRE)**.

21. kongreya KOMKARê lidarket

Wuppertal (Rûdaw) - KOMKAR-Almanya 26-27ê Gulanê li bajarê Almanya Wuppertalê 21. kongreya xwe ya giştî lidarxist. Derdorê 100 delege û mêvan beşdarî kongreyê bûn. Kongre di jêr slogana "Piştgiriya xurt na nevnetewi bo tevgera Kurd li Sûriyê" birêveçû.

Wêne: Rûdaw

Di nav mêvan û delegeyên kongreyê de kesayetiyên weke Nizamettin Ariç, Xêro Abbas, Şivan Perwer, Ganî Nar, serokê PSKê Mesût Tek, Mehmet Bayrak, Eskerê Boyik, Riza Çolpan, serokê KOMKAR.eu Kovan Amedî û parlementerê esilçerkes yê ji Partiya Kesyan ya eyaleta NRW Arif Ünal jî hebûn.

Di kongereyê de gellek beşdaran bang li Kurdan kirin ku piştgiriya Kurdên Rojavayê Kurdistanê bikin û wan di van rojên dijwar de bi tenê nehêlin. Ji bilî banga piştgiriya Kurdên Rojavayê Kurdistanê, hunermendê mêvan Nizamettin Ariç partiyên Rojavayê Kurdistanê rexne kirin ku bi hejmara xwe ya mezin bûne sedema dabeşbûna Kurdên wî parçeyê Kurdistanê. Nizamettin Ariç bal kişand ser hebûna bêtirî 15 partiyên kurdî li Rojavayê Kurdistanê û got ku ev ne rewşek qebûlbar û mantiqî ye û ji ber tenêhiştina Rojavayê Kurdistanê ji aliyê Kurdan ve, ew beş wek "sêwiyê Kurdistanê" bi nav kir.

Serokê PSKê Mesûd Tek jî bangî beşdarên kongreyê û rêxistinên Kurdan kir ku ji bo yekîtiya Kurdan hevsoz bin û got ku di warê siyasî de yekîtiya Kurdan pêk hatiye û ev nîşana wê yekê ye ku dema lidarxistina Kongereya Netewî jî hatiye. Mesûd Tek gavên hikûmeta AKPê jî erênî nirxand, lê bang jî kir ku ev gav têr nakin û divê dest ji rêbazên çareserkirina pirsa kurdî bi tundûtûjiyê bê berdan û got ku êdî şerê çekdarî zirarê dighîne tevgera kurdî li Bakurê Kurdistanê û banga agirbestê li hikûmeta Tirkiyeyê û PKKê kir.

Di nav biryarên kongreya KOMKARê de daxwaza statûyekî siyasî ji bo Kurdan li Bakurê Kurdistanê û herwiha perwerdeya bi zimanê kurdî, ji bo Kurdên li Almanyayê jî daxwaza qebûlkirina Kurdan weke neteweyekî serbixwe cîh digrin. Kongre herwiha rewşa Başûrê Kurdistanê weke rewşekî ku hîn jî metirsî li ser destkeftiyan heyî binav dike û bangî hemû hêzên Kurdan dike ku li Başûrê Kurdistanê xwedî derkevin û destkeftiyên wê biparêzin. Herwiha kongre amadebûna xwe bo alîkariya bi Rojavayê Kurdistanê re tînê ziman û banga piştgiriyêa vî beşê Kurdistanê li hemû rêxistinên Kurdan dike.

Rûdaw

Rojnameyeke siyasî û heftane

Xwedî
Rudaw Media GmbH

Sernûser
Ako Mihemed
akopress74@yahoo.com

Rêvebirê Nivîsînê
Nasredîn Akyol
nasredin@rudaw.eu

Redaksiyon
Mehmet Sebatli
sebatli@hotmail.com

Besam Mistefa
wardoz@gmail.com

Mihemed Tahir
mtahir2011@windowslive.com

Dîzayner
Hamdullah Yumlu

Îdare û belavkirin
Mustefa Sefîq Edilbî
gare2005@hotmail.de

Şêwirmendê yasayî û aborî
Ayhan Çiftçî

Marketing û reklam
Mansour Sedghi
m.sedghi@rave-online.org

Navnîşan
Rudaw Media GmbH
Gutenbergstr. 63a
50823 Köln/Germany

Pêwendî
Telefon: +49 (0) 221-26 00 40 02
Telefax: +49 (0) 221-26 00 49 81
www.rudaw.net / www.rudaw.eu
info@rudaw.eu

Belavkirin / Vertrieb:
Axel Springer Vertriebsservice GmbH
Süderstraße 77
20097 Hamburg
www.as-vertriebsservice.de

Rûdaw ji bo nivîsên ku bi nav tên weşandin ne berpirsyar e.

© Hemû maf parastî ne

www.archivakurd.org

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî jî tevlî merasima binaxkirina enfalkiriyan bû û cenazeyê yekemîn ji aliyê Barzanî ve hat veşartin.

Wêne: Rûdaw

Termên 730 Enfalkiriyan gihiştin Kurdistanê

Termê yekemîn ji aliyê Barzanî ve hat veşartin

Çemçemal (Rûdaw) – Sêşema borî (29.05.2012) merasîma veşartina termên 730 enfalkiriyên bajarokê Çemçemal li Başûrê Kurdistanê bi beşdariya serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî û gellek berpirsên hikûmî pêk hat û cenazeyê yekemîn ji aliyê Barzanî ve hat veşartin. Termên enfalkirinyan par di goreke bi kom li Mehariya li parêzgeha Dîwaniye li başûrê Îraqê hatibûn dîtin.

Karwanê termên enfalkiriyan ji aliyê leşkerên kurd li aliyê rast û çepê yê rê ku luleyên tifengên xwe ber bi jêr kiribûn û destê silavê bilind dikirin, hatin pêşwazîkirin. Jin, mêr û zarok bi silavkirin û rakirina gulan bo termên enfalkiriyan, di rêya dûr û dirêj a 730 termên enfalkiriyan de ketibûn rêzê. Hewar û girî li seranserê bajarokê Çemçemal dihat bihîstin, jin û keçan xwe bi cilên reş pêçabûn; "Way birayê min ê parêzvanî lê nehatî kirin.. wey xwişka min a zilim lê hatî kirin, tu xêr hatî gel me..."

Wêne: Rûdaw

Şofêrên otomobîlên ku term di nav de, pêşmergeyên ciwan bûn û ji sibehê ve ji bo gihandina wan terman bo Çemçemal ketibûn ser rê. Beşek ji wan bi girî û çavê tijî rondik ji nav qerebalixiyê derdiketin, hinek rojnamevan jî hebûn xwe nedigirtin û digiriyan. Xizim û kesên beşdarî merasîma veşartina wan 730 termên Enfalkiriyan bûyîn, çûn jêra Çemçemalê û cangoriyên Kurdistanê bo cara dawî li ser xaka bav û kalên wan veşartin.

Merasîma veşartina termên Enfalkiriyan li Çemçemal di saet 16:00 de dest pê kir. Piştî merasîmê, termê yekemîn ji aliyê Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ve hat veşartin. Di merasîmê de ji bilî Barzanî, cîgirê sekreterê giştî yê YNKê Dr. Berhem Salih, parêzgarê Kerkûkê Dr. Necmedîn Kerîm, wezîrê Şehîd û Enfalkiriyan Aram Ehmed û hêjmarek berpirsên Herêma Kurdistanê jî beşdar bûn.

Duşemê (28.05.2012) jî merasîma anîna termê 730 enfalkiriyan bi amadebûna hêjmarek binemalên şehîd û enfalkiriyan, cîgirê serokê Herêma Kurdistanê, serokwezîr û cîgirê serokwezîrê Herêma Kurdistanê, hêjmarek kesayetî, berpirsên îdarî û siyasî li navçeya Germiyan hat sazkirin. Wezareta Şehîd û Enfalkiriyan sala 2011ê ragihandibû ku çend gorên bi kom li parêzgeha Dîwaniye li başûrê Îraqê hatine dîtin û wê piştî kolandin û testa pizîşkî termên goriyan bînin Kurdistanê. Li gor gotina rêvebera giştî ya li Wezareta Şehîd û Enfalkiriyan û serpereştyara gorên bi kom, Perwîn Nûrî Ezîz, "Çend nasname di nava gora bi kom de hatine dîtin ku pirraniya wan ên nahyeyên Qerehencîr û Qadiriye ne."

Wezîrê Karûbarên Şehîd û Enfalkiriyan, Aram Ehmed, di merasîmê de axivî û got: "Li gor belge û lêkolînan, beşek ji wan enfalkiriyan hatine gulebarandin û beşek jî bi zindî hatine binaxkirin."

Nêçîrvan Barzanî: Sûcê wan ew bû ku ew Kurd bûn

Serokwezîrê hikûmeta Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî jî di merasima anîna termê 730 enfalkiriyan de axivî û got: Anîna cenazên 730 enfalkiriyên Germiyan diyar kir ku dil û ciger û beşek ji dîroka tirajîk a netewa me cardin li xaka pîroz a welatê xwe em bi erd dikin, ku hêviya me ewe nifşên niha û nifşên pêşerojê carek din çavên wan van tirajediyan nebînin.

Nêçîrvan Barzanî dewam kir û got: "Ew 730 şehîd tenê ji ber yek tiştî hatin enfalkiran û şehîdkirin, ew jî ji ber ku Kurd bûn. Eger ku armanca enfalan tinekirina Kurdan e, wê demê enfalcî li dijî parvekirinên xwedayê mezin jî bûn.

www.arsivakurd.org

Berdevka baskê jinên BDPê, Kîbriye Evren:

Li Girtîgeha Şakran jinên kurd hatine tazîkirin

Çalakvanekî mafê mirovan: Eger rast be karesat e.

Hêmin Xoşnaw

Berdevka baskê jinên BDPê, Kîbriye Evren, ji Rûdawê re got ku li girtîgeha Şakran li bajarê Îzmîrê jinên kurd yên girtî tên tazîkirin. Parlementerekî AKPê jî dibêje ku haya wî ji vê yekê tine û sozê dide ku vê nûçeyê bişopîne.

Girtîgeha Şakran li Îzmîrê yeke ji girtîgehên ku di serdema desthilata AKPê de li Tirkiyeyê hatine dirustkirin. Armanca dirustkirina wê jî bicîhkirina pîvanên Yekîtiya Ewropayê ye derbarê parastina mafên girtiyan. Girtîgeh têra 10 hezar girtiyan dike û wek girtîgeha tîpa F tê naskirin. Girtîgeh ji rojnamevanan re nayê vekirin.

Hefta borî şanda Komeleya Mafê Mirovan û ya BDP di girtîgehê de lêkolîn kirin

Berdevka baskê jinên BDPê, Kîbriye Evren, derbarê rewşa girtiyên jin yên di girtîgeha Şakran de dibêje: "Li wê girtîgehê îşkenceyeke pirr bi xof tê meşandin." Li gor gotina Kîbriye, jinên kurd yên ku li ser siyasetê tên girtin, di vê girtîgehê de tên bicîhkirin û rastî pratîkên nemirovane û tund tên: "Li gor zanyariyên ku ji çend hevalên me yên girtî gihiştine destê me, îşkenceyeke bi xof li wê girtîgehê heye, jin di dema lêkolînê de tên tazîkirin û deriyên odeyên wan li ser piştê tên vekirin û polîs li wan dinêrin. Jinên girtî gava ji bo tedawiyê bo cem doktoran tên birin, li pêşberî nobedaran tên tazîkirin. Sîstema raweste û rûne tê pêrewkirin."

Derbarê çawaniya bidestxistina van zanyariyan, Kîbriye dibêje: "Turkan Îpek ku demeke li ser dosyaya PKKê hatiye girtin, zanyarî dane me. Gava eşkere bû ku Turkan zanyarî dane, ew hat veguhastin ji bo odeyeke taybet û her çiqasî nexweşiya wê ya demdirêj heye û pêdiviya wê bi dermankirinê heye, lê pêdiviyên wê nayên dabînkirin. Parlementerên me serdana wê girtîgehê kirin û nivîsarek pêşkêşî wezareta dadê jî kirin, lê heya niha ti bersivek nedane."

Girtîgehên Tirkiyeyê li ser wezareta dadê ya Tirkiyeyê ne û şêweya tevgera ligel girtiyan bi fermana wezareta navborî tê diyarkirin. Lewma eger ev rast be, êdî wezareta dadê ya Tirkiyeyê rasterast wek berpirsa yekê ya wê binpêkirinê tê hejmartin. Lê heya niha ji xeynî çavkaniyên BDPê, ji aliyê ti aliyekî din ve ev agahî nehatiye piştrastkirin.

Berî çend mehan skandala destdirêjiya ser zarokên kurd li girtîgehan ji aliyê zindaniyan bi xwe ve kêşeyeke mezin li Tirkiyeyê dirust kir. Di encamê de jî girtîgehek hat girtin û zarok ji bo girtîgeheke din hatin veguhastin.

Bi baweriya hevseroka BDPê, Gultan Kîşanak, rêveberên girtîgehan fermanên wezareta dadê bi awayekî xirab bikar tînin: "Wezîrê dadê di sala 2009ê de desthilat da reveberên girtîgehan ku jinên gumanbar di dema lêkolînê de tazî bikin. Ev ferman jî ji aliyê berpirsên girtîgehan bi awayekî xirab tê bikaranîn û em dikarin bêjin li ser pirraniya jinên girtî tê ceribandin."

"Dengê me nagihije raya giştî"

Li gor agahiyên Kîbriye, ji xeynî rojnameya Milliyetê ti medyayeke din ya Tirkiyeyê behsa vê babetê nekiriye: "Dengê me nagihije raya giştî, ji ber ku ragihandina Tirkiyeyê bi fermana Erdogan boykota me kiriye. Kiryarên girtîgehan bêyî pirsa wezareta dadê nayên kirin, bi baweriya min haya berpirsên wê wezaretê jê heye, lê xwe kerr dikin."

Parlementerê bajarê Batmanê yê AKPê Zîwer Ozdemîr jî dibêje ku ev cara yekê ye ew vê yekê dibihîse û soz da ku vê yekê bişopînê. Derbarê rewşa girtîgehan û tevgera ligel zindaniyan Zîwer Ozdemîr ji Rûdawê re got: "Li Tirkiyeyê yasaya birêvebirina girtîgehan li gor krîterên Yekîtiya Ewropayê hatiye rastkirin. Girtîgeh ji aliyê komisyona mafê mirovan li parlementoyê tên çavdêrîkirin. Rê nayê dayîn ku binpêkirin rû bidin. Eger binpêkirin hebin, an rêveberiya girtîgehan desthilatên xwe bi awayekî xirab bikar bîne, di cîh de lêpirsîn tê vekirin."

Rizwan Kayayê serokê Özgurderê, ku rêxistineke mafê mirovane li Tirkiyeyê, ji bêdengiya wezareta dadê û hikûmetê li hember wê bangewaziyê dilgiran e: "Carnan behsa vê mijarê tê kirin. Nizanim rast e yan na. Eger rast be karesat e, eger ne rast e jî pêwist e wezareta dadê û dezgehên têkildar raya giştî piştrast bikin ku tiştekî wiha tine."

Partiyên Kurdan ji makezagona nû bêhevî ne

Kemal Avci Enqere

Parlementoya Tirkiyeyê dest bi xebatên makezgona nû kir. Serokwezîr Tayyîp Erdogan daxuyand ku xebatên bo makezagona nû wê heta dawiya salê bi dawî bibin û di destpêka 2013ê de jî wê makezagon amade be. Nûnerên partiyên Kurdan jî bo Rudawê daxuyandin ku makezagona nû bo çareserkirina pirsgirêka Kurd fersend derxistiye holê lê gotin hevkarî û hevbeşiya her çar partiyên parlementoyê pêwîst e û dan zanîn ku helwesta AKPê hêviya wan nahêle.

Tan: Makezagona ku mafên Kurdan nas neke, nabe tiştekî nû, dibe makezagona Hitler.

Nûnerê Komisyona Hevkariya Makezagonê ya Meclisa Tirkiyeyê û parlementere BDPê yê Amedê Altan Tan ragihand makezagoneke hemdem, demokratîk û ya ku tê de standardên gerdûnî hebin wê çareserkirina pirsgirêka Kurd hêsantir bike, lê ne wisa be wê pirsgirêkê bêhtir kûr bike û wiha axivî: "Divê makezagona nû rêya perwerdeya bi zimanê zikmakî, rêvebiriya herêmî û bikaranîna zimanê kurdî di jiyana rojane û xebatên fermî de veke. Eger ev mijar weke berê di nava nîqaşan de bimînin û neyên çareserkirin, wê gavê ew nabe makezagoneke nû, dibe makezagona Hitler û ya Mousolini."

Tan destnîşan kir ku naveroka makezagona nû bi helwesta Erdogan ve girêdaye û axaftina xwe wiha dom kir: "Daxuyaniyên Serkwezîr Erdogan yên dawî qet hêvî nadin mirov. Eger niyeta Erdogan ya çareseriyê hebe, divê berê xwe bide amadekariyeke makezagoneke nû. Lê daxuyaniyên wî yen dawî ne tenê şaş in, herwiha bêhna nexweşiyeke giran, nexweşiyeke psîkolojîk jê tên. Em ligel hemû van kêmasiyan hêviya xwe diparêzin."


Şerafettîn Elçî

Altan Tan

Bayram Bozyel

Elçî: An bila nasnameya kurdî bê naskirin, an jî destnîşaniya ti nasnameyek neyê kirin.

Serokê Giştî yê KADEPê û parlementerê Amedê yê BDPê Şerafettîn Elçî jî ragihand ku awayê binavkirina Kurdan di makezagonê de gellekî girîng e û got, "an navê nasnameya kurdî derbas bibe, an jî bila navê ti nasnameyek û etnîsîteyeke din derbas nebe." Elçî destnîşan kir ku pêwîst e di makezagona nû de garantî bo nasnameya kurdî û perwerdeya bi zimanê zikmakî hebin, lê got, "wisa xuya dike ku ev yek zehmet e di pratîkê de pêk bê." Elçî wiha axivî: "Sedemê yekem ku ez bêhêvî dibim ew e ku divê herçar partiyên parlementoyê hevkariyê bikin; ango ji serî de diyar e ku MHP ya ku dewletê wek dewleta Tirkan dibîne, her kesî ku li vî welatî dijî wek Tirk dibîne, ne mimkin e ku ji bo makezagoneke demokratîk ya ku mafên Kurdan jî destnîşan dike, razî bibe. Sedemê duyem, helwesta partiya mezin a AKPê ye. Erdogan û hemû nûnerên AKPê di demên dawî de hertim behsa yek dewlet, yek milet, yek ziman dikin. Lê emê bisekinin û binêrin, dibe ku di pêşerojê de şert û rewş biguherin û ew jî polîtîkaya xwe biguherînin."

Bozyel: Divê federalî bê pejirandin

Serokê Giştî yê HAK-PARê Bayram Bozyel jî ragihand makezagoneke nû divê çareseriya pirsgirêka Kurd bide ber xwe û ev şert rêzkirin: Naskirina nasnameya kurdî, garantîkirina perwerdeya bi zimanê zikmakî, pejirandina kurdî wek duyemîn zimanê fermî li Kurdistanê, mafê rekxistinê yê bê asteng, mafê rêveberiya herêmî ya demokratîk, li deverên ku Kurd zede dijîn avakirina sîstema federal." Ji bo amadekariya makezagoneke nû têkoşîna Kurdan pêwîst dibîne û dibêje: "Divê ji serî de mirov nebêje wê tiştek baş ji vê makezagonê dernekeve, divê mirov zextan li wan bike. Lê dema mirov li rêbazên amadekariyê mêze dike, hêviya makezagoneke nû di dilê mirov de namîne."

www.arsivakurd.org

Balyozê berê yê Amerîka li Azerbeycanê, Matthew Bryza, ji Rûdawê re:

Di warê stratîjîk de Herêma Kurdistanê ji bo Ewropayê pirr girîng e

Matthew Bryza di navbera 2010 û 2012ê de balyozê Amerîka li komara Azerbeycanê bû. Berê jî li Qesra Spî kar kiriye û 4 salan jî li wezareta derve ya Amerîkayê wek şêwirmendê karûbarên welatên Ewropa û Asyayê kar kiriye. Bryza niha rêveberê navendeke şêwirmendiyê ye ji bo karûbarên enerjiyê li welatên rojhilatê Ewropa, Tirkiye û Rojhilata Navîn. Di vê hevpeyvîma ligel Rûdawê de Bryza behsa pêwendiyên Kurdistan û Tirkiyeyê dike. Di baweriya Bryza, Kurdistan wê di siberojê de roleke serekî di dabînkirina gaza xwezayî de ji bo bazarên cîhanê bilîze.

Rûdaw: Bi awayekî zêde behsa girîngiya bihêzbûna pêwendiyên Tirkiye û Herêma Kurdistanê di van çend salên borî de tê kirin, bi baweriya we girîngiya van pêwendiyan di çi de ye?

Matthew Bryza: Tevgera dramatîkî ya hikûmeta Tirkiyeyê bi Herêma Kurdistanê re diselimîne, ku niha Tirkiye bi vê guherîna dîrokî ku derketiye rehet e. Herwiha rehet e jî bi avakirina Rojhilata Navîn. Bi Kurdên Tirkiyeyê re jî dibe ku êdî Tirkiye Kurdan wek rîskeke siyasî nebîne û hikûmet wek beşekî girîng yê civakê li wan binêre. Di warê enerjiyê de jî hebûna rêjeyeke zêde ya gaz û petrolê li Kurdistanê û egera şandina derve ya wan çavkaniyên xwezayî ji bo sûkên Tirkiyeyê, û piştre jî ji bo welatên Ewropayê, wisa dike ku bandoreke stratejîk ya mezin li ser navçeyê bike.

Hûn çawa li hewldanên van salên dawî yên Herêma Kurdistanê ji bo xurtkirina pêwendiyên xwe bi Enqere re dinêrin?

Ew gav pirr balkêş in. Ji ber li bîra min e, gava min di salên piştî 2001ê de li Qesra Spî û wezareta derve ya Amerîkayê kar dikir, me hewldanên zêde dikirin, d ku Tirkiyeyê qayîl bikin ku tenê civînekê bi berpirsên Herêma Kurdistanê re saz bike. Guherîna niha nîşan dide ku siyaseta Tirkiyeyê jî guheriye. Lê siyaseta hikûmeta Herêma Kurdistanê pirr zîrek bû û di rûyê Tirkiyeyê de vekirî ye. Ev hikûmet dizane ku Tirkiye li navçeyeke stratejîk e, lewma Kurdistanê kariye warê enerjiyê bikar bîne ji bo xurtkirina pêwendiyên xwe bi Tirkiyeyê re.

Yek ji sedemên ku di dema borî de wisa li Tirkiyeyê kir ku bi xweparêzî bi Kurdan re tevbigere, pirsa serxwebûnê bû. Niha jî bi awayekî zêde behsa vê pirsê tê kirin. Hûn çawa li vê pirsê dinêrin. Gelo ji bo Kurdan mabûna di çarçoveya Îraqê de baştir e yan serxwebûn?

> **Guherîna niha nîşan dide ku siyaseta Tirkiyeyê jî guheriye. Lê siyaseta hikûmeta Herêma Kurdistanê pirr zîrek bû**

Nirxandina min ya takekesî ew e ku serkirdayetî û xelkê Herêma Kurdistanê daxwaza heman tiştan dikin ku gelên din jî dixwazin. Ku ew jî hebûna jiyaneke asayî, aram û xweş e. Niha jî bi dîtina min ev jiyan bidest anîne. Ji min re cîhê pirsyarê ye, ku ji ber çi tu dixwaze vê rewşa aram biguhere? Pêwendiyan wan jî bi Tirkiyeyê re sedemekî serekî ye ji bo dabînkirina destkeftan. Lewma ji ber çi tu dixwaze biguhere?

Bandora Herêma Kurdistanê, nemaze di warê gaz û petrolê de, di siberojê de li ser navçeyê çawa dibînin?

Bêguman bandora wê mezin dibe. Dixwazim bandora wan li ser Tirkiyeyê teqez bikim. Li gor texmîna herî dawî, li Herêma Kurdistanê dora 45 milyar bermîlên petrola yedek hene. Ev jî tê wateya ku Kurdistan dibe hevpeymaneke bazirganî ya girîngî ji bo Tirkiye û welatên Ewropayê. Li Herêma Kurdistanê rêjeyeke zêde ya gaza xwezayî heye. Ev jî tê wateya ku Tirkiyeyê şirîkekî nêzîk bi dest xistiye, ku dikare gaza pêdivî peyde bike. Lewma Herêma Kurdistanê girîng e ji bo Tirkiyeyê, ji ber ku dikare Tirkiye ji gellek pirsan rizgar bike.

Behsa beşdariya Kurdan di projeya Nabucco de tê kirin, gelo Kurd beşdar dibin û girîng e?

Her projeyeke ku gaza xwezayî ji Îraqê bibe Ewropayê, di aliyê stratejîk de, pirr girîng e. Ji ber ku pêdiviya Ewropayê di warê enerjiyê de bi alîkariyê heye. Rola Herêma Kurdistanê pirr girîng e, ji ber rêjeyeke zêde ya gaza xwezayî li Îraq û Kurdistanê heye.

Amerîka roleke berçav lîstiye ku Herêma Kurdistanê gihiştiye vê asta niha. Lê berevajî welatên Ewropayê, hejmareke zêde ya şîrketên amerîkî li Kurdistanê nayên dîtin. Ji ber çi?

Rast e û cîhê dilgiraniyê jî, lê sedemê nehatina hejmareke zêde ya şîrketên amerîkî yên enerjiyê ew e ku şîrketên vî warî rêza hikûmeta federal ya Îraqê digirin û naxwazin bikevin nav nakokiyên siyasî û yasayî ku hêjî di navbera Bexda û Hewlêrê de nehatine çareserkirin. Bêguman pêwîst e bên çareserkirin jî. Bi baweriya min hinek ji wan şîrketan ditirsin, eger bilezînin di vê mijarê de û bêne Kurdistanê, karên xwe li başûr û naverasta Îraqê ji dest didin. Lê hêvîdar im ev pirs di demeke herî zû de bên çareserkirin û şîrketên amerîkî jî bên Kurdistanê.

Hevpeyvîn: Hawar Ebdilrezaq

Şirove

Sefera wezîrê tirk ya Hewlêrê

Mahmut Kilinc

Naziyan Swêd dagir nekirin, ji ber ku di navbera Almanyaya Nazî û Swêdê de rêkeftinek hebû û Naziyan pêdiviya hesin ya endustriya welatê xwe ji sedî 85 ji vî welatî peyde dikirin. Wê demê Naziyan amedekariya dagiriya hemû welatên Ewropayê dikirin, diviyabû endustriya şer ranewestiya û ji bona vê jî jêderkên hesin gellekî girîng bûn.

Dema ku nûçeya sefera wezîrê çavkaniyên xwezayî yê tirk bo Başûrê Kurdistanê di medyayê de cîh girt, daku bi Başûrê Kurdistanê re bona petrola xam rêkeftinek hat îmza bike, ev mînak hate bîra min. Helbet Tirkiye bi qasî Naziyan, di her hêlê de, ne bihêz e, lê fêla wê ne paqij e. Jixwe em dibînin, dixwaze destê xwe bike nav karûbarê dewletên herême. Vê mafê xwe dibîne!

Em dizanin ku îro di budceya Tikiyeyê de nokteya serfiyetê ya herê mezin kirîna petrolê ji derve ye. Bona sivikkirina vê noqteyê û geşkirina aboriya vî welatî, bidestxistina derfetek weha gellekî girîng e. Helbet bona Başûrê Kurdistanê jî ev têkilî û şandina petrol ji derve re gellekî girîng e û taybetî bona geşdariya civakê divê ev derfet bi kar bê. Lê dîvê me hay ji siyaset û fêla Tirkiyeyê jî hebe, divê armancên wê yên emperyal bên dîtin.

> **Armancên emperyal in ku dixwaze herêmê bike bin bandora xwe, nifûsa xwe li herêmê bi cîh bike.**

Herweha ew dewletek keysbaz e, tenê dide dû berjewendiyên xwe, ti nirxên mirovî ne xem e bona wê. Li helwesta wê ya derbarê qetlîama Roboskiyê binêrin, ne hewce ye mirov qala tiştên din bike.

Herweha pêwendî û têkiliyên wê bi dewletên herême re jî mînakên gellekî balkêş in. Siyaseta Tirkiyeyê, taybetî di deh salên dawî de, sal bi sal kete nav guhertinek fireh. Ewil bi hinek dewletên herêmê re dest bi dayîn û stendinê kir. Ji Lîbyayê bigrin heta Afganistanê, Pakistanê, li seranserê herêmê pêwendiyên geş hatin damezrandin. Hikûmeta Tirkiyeyê peyamên xwe bi peyvên biratiya olî, hevkarî û alîkariyê dixemiland, heta di navbera hinek welatan û Tirkiyeyê de bi dehan rêkeftin hatin îmzakirin, hikûmetên van welatan bi ya Tirkiyeyê re bi hev re civiyan, biryarên hevpar stendin. Ji vana du dewlet ên herî balkêş bûn; Îraq û Sûrî. Lê pirr ne ajot, li van welatan aloziyê rû da û Tirkiyeyê xwe da aliyê serhildêran, navê wê bi hinek provokasyonan ve hat bihîstin. Her çiqas ev helwesta wê bo alîkariya qaşo bicîhkirina demokrasiyê li van welatan bû, lê rastî ne ev bû, ji ber ku sistemên van welatan berê jî ne demokrasî bûn. Provokasyonên wê ên derbarê pirsgirêka Kerkûkê de hêj nehatine jibîr kirin.

Bi ya min, du armancên Tirkiyeyê yên sereke hene: yek ji vana, ya herê girîng, armancên emperyal in ku dixwaze herêmê bike bin bandora xwe, nifûsa xwe li herêmê bi cîh bike. Ya din, her çiqas ew li xwe mukûr naye jî, li welatên herêmê bicîhkirina desthilatiya Îslama siyasî ya sunnî ye. Ji ber vê siyaseta xwe îro bi gellek dewletan re ne dost, êdî wek dijmin li dijî hev radiwestin. Gotin ev e, ku helbet Kurd wê bi her dewletê re, taybetî bi cîranên xwe re, pêwendiyan damezrînin. Di van pêwendiyan de du xalên girîng; yek ji vana, divê berjewendiyên xwe bişopînin û ew pêwendî ne li dijî têkoşîna parçeyên din bin. Herweha nebin amrazê armancên emperyal.

www.arsivakurd.org

Azadi Energy... “kê vexwaribe, jê kêfxweş bûye“

Azad Dîcle

Xortê kurd Azad Mehmet Can li Almanyayê vexwarineke bi navê Azadi Energy berhem anî û niha dixwaze ev vexwarin pêşî di nava Kurdan de bê naskirin û paşê li seranserê Almanyayê belav bike. Can derbarê hewldanên xwe ji Rûdawê re ragihand ku armanca wî ne qezenckirina pere ye, “ez dixwazim ku berhemeke kurdî hebe, bi navekî kurdî”.

Sala borî li bajarê Almanyayê Oldenburgê Kurdekî bi navê Azad Mehmet Can (27) û hevalekî wî yê Almanê ji Awisturyayê li ser çêkirina vexwarineke enerjiyê mijûl dibin û hevalê wî yê alman dest bi çêkirina vê vexwarinê dike. Li gor gotinên Azad, hevalê wî yê alman piştî heftiyekê vexwarinek amade kiriye lê gotiye, “Mixabin wek kopiya Redbullê ye û eger em wiha derxînin bazarê, wê şîrketa Redbull li dijî me dozê veke.”

Ji bo nekevin nav pirsgirêkên bi Redbull re, Azad û hevalê xwe li rêyek din geriyan: “Piştî vê agahiyê, me rêjeya şîr di nava vexwarina xwe de zêde kir, heta ji sedî 51. Bi vî rengî vexwarina me dikeve nava berhemên kategoriya şîr. Ji bilî şîr, koffeîn, şekir, çendîn mîneral û vîtamîn jî tê de hene.”

Mehê 3 hezar tên firotin

Di nîvê sala 2011ê de vexwarina Can û hevalê wî yê alman amade ye û li bajarê Oldenburgê serî li patentê didin. Di demeke kurt de di bin navê Azadi Energy de patentê werdigrin û dest bi berhemanîna wê dikin. Azadi Energy niha tenê li bajarê Oldenburgê li çendîn dikan û diskotekan tê firotin û wek ku Azad dibeje, “niha mehana 2 palet zêdetir, ango 3 hezar qutî, tên firotin, lê em hewl didin bi reklaman û rêyên din berhema xwe pêşî di nava Kurdan de, paşê li seranserê Almanyayê belav bikin.“ Can destnîşan kir ku berhema wan li gor norm û standardên berhemanîna Ewropayê hatiye çêkirin û got, “Heta niha kê vexwaribe, jê kêfxweş bûye.”

Wêne: Rûdaw

“Bila markeyek kurdî jî hebe”

Wek ku Azad diyar kir, tenê dema ku Azadi Energy li Oldenburgê ket bazarê, di rojnameyeke herêmî de derbarê Azadi Energy de nûçeyek derketiye û got, “Rûdaw wê bibe yekem rojname ku berhema me dide nasîn.” Bihayê qûtiyek Azadi Energy bi 1,5 Euro tê firotin û xwediyê navê wê Azad Mehmet Can got ku armanca wî ne tenê qezenckirina pere ye, “Ez dixwazim bi navê kurdî jî markeyek vexwarinê hebe.”

Azad Mehmet Can ji Nisêbînê ye û di zarokatiya xwe de ligel malbata xwe hatiye Almanyayê û li vir lîse qedandiye û paşê jî dibistanek bi bazirganiyê taybet xilas kiriye. Ew niha xwediyê kioskekî ye û Azadi Energy li wir difiroşe. Herwiha dema ku çalakî û şahiyên Kurdan çêdibin, Azad û hevkaren xwe Azadi Energy difroşin û bi Kurdan didin nasîn. Azad bi hêvî ye ku Azadi Energy bala dikandarên kurd bikşîne û bi wî re bikevin pêwendiyê, daku Azadi Energy li seranserê Ewropayê bê belavkirin.

5. Konferansa Dêrsimê wê li Parlemena Ewropayê bê lidarxistin

Kurdên Dersimê li dadê û mafên xwe digerin

Munchen (Rûdaw) - Roja 7ê Hezîranê li Brûksele li avahiya Parlemena Ewropayê 5. konferansa derbarê komkujiya Dêrsimê ya salên 1937-38 tê lidarxistin. Organizasyona konferansê çend komele û însyatîfên Dêrsimê dikin û Grûbên Çep û Keskan yên li Parlemena Ewropayê jî piştgiriyê didin. Li gor agahiyên ku Serokê Civaka bo Dîsaavakirinê (Gesellschaft für Wiederaufbau e.V.) Haydar Işik dane Rûdawê, konferans di bin slogana “Dêrsim: ji 1935-1938 heta îro – Rola Hiqûqa Navnetewî û ya Komara Tirkiyeyê” tê lidarxistin. Işik got, “hiqûqnas, rojnamevan, nivîskar, dîroknas, endamên Parlemena Ewropa û Tirkiyeyê, şahîdên wê demê, xizmên kuştiyên komkujiyê û çendîn siyasetmedar wê beşdarî konferansê bibin û biaxivin.”

Wêne: Rûdaw

Haydar Işik: Dewleta Tirk xwestiye li Dêrsimê nîjada Kurd biqelîne

Serokê Komela Dêrsimê Haydar Işik bi bîr xist ku di navbera salên 1937 û 1939ê de li herêma Dêrsimê hêzên dewleta Tirk li dijî Kurdan siyasetek sistematîk û bi plan ya komkujiyê bikaraniye: “Li gor agahiyên fermî 13 hezar û 806 kes hatine kuştin û 12 hezar kes jî sirgûnê Tirkiyeyê bûne. Li gor agahiyên nefermî jî nêzikî 90 hezar kes hatine kuştin. Serokê berxwedana Dêrsimê Seyît Riza jî hat darvekirin.” Işik herwiha got: “Em hewl didin ku komkujiya Dêrsimê bibin Dadgeha Navnetewî ya Tewanan a Bilind. Dewleta Tirk divê sûcê xwe qebûl bike. Dewleta Tirk xwestiye li Dêrsimê nîjada Kurd biqelîne, ji holê rake. Tirkiye îro jî siyaseta xwe ya komkujiyê berdewam dike. Serokwezîrê Tirkiyeyê Erdogan bi fermî got 50 hezar kes hatine kuştin. Kurd jî dibêjin ev hejmar 70 an jî 90 hezar e.”

Nûnerên Ermenî, Asûrî û Cihûyan jî tevlî dibin

Mêvanên ku tevlî konferansê dibin, yên heta niha eşkere bûne ev in: Ji Amerîkayê hiqûqnas Prof. Dr. Mr. Barry Fisher; ji Almanyayê Prof. Dr. Ronald Mönch, Ji Tirkiye û Kurdistanê hiqûqnas Erdal Dogan û Yusuf Alataş. Nûner û tevgerên Ermeniyan, Cihûdan û Asûriyan jî beşdarî Konferansê dibin. Işik got ji Başûrê Kurdistanê jî di bin serokatiya hiqûqnas Kardo Pirdavud endamên Komîsyona Hiqûqe jî bo konferansê hatine dawetkirin.

Organizatorên konferansê jî Dêrsim- Civaka bo Dîsaavakirinê, Însyatîfa Dijî Komkujiya Dêrsimê 37/38, Komeleya Kurmeşiyan û Federasyona Demokratîk ya Elewiyan e. Konferans wê di saet 09:00ê de dêst pê bike û heta êvarê saet 18:30 dombike.

Bi me cihêwaz bibin.
Reklam
Ji bo reklam, dîzayn û çapkirinê em di xizmeta we de ne.
Reklama televizyon û rojnameyan, flayer, afîş, name, eşyayên xelatan, kovar, pirtûk, malperên înternetê, dawetname…htd.
Bi kurtasî ji bo her pêwîstiyek we di aliyê reklam û çapkirinê de…
Hûn jî xwe bighînin me…
Hûn jî cihêwaziyê his bikin!
graf-adolf-str. 70a
40210 düsseldorf
tel.: 0211 - 17957982
fax: 0211 - 17957983
www.dassign.de
info@dassign.de
DAS | SIGN®
werbeagentur & verlag gmbh
mobil : 0173 - 270 67 81

www.arsivakurdi.org

Bi rêya bernameya Erasmusê

Xwendekarên Kurd li Portugalê ne

Wêne: Rûdaw

Zinar Ala Porto

Erasmus bernameya xwendinê ya herî navdar e li Ewropayê. Navê Erasmus ji îngilîzî hatiye (European Region Action Scheme for the Mobility of University Students) û bi kurdî tê wateya "Plana Aksiyonê ya Civata Ewropî ji bo Gera Xwendekarên Zanîngehan". Ev program ji sala 1987ê ve ava bûye ji bo hêsankirina gera akademisyen û xwendekaran di navbera zanîngehên welatên Yekîtiya Ewropayê de û ji bo xurtkirina hevkariyê di navbera zanîngehên ewropî de hatiye avakirin. Xwendekarên ji Tirkiyeyê jî sûdê ji vê bernameyê werdigirin, ji ber wê jî gellek xwendekarên kurd ji Bakurê Kurdistanê jî beşdarî vê programê dibin.

Mehmet Arda Özdal jî yek ji wan Kurdan e ku sûdê ji bernameya Erasmûsê werdigrê ye. Me Memo (wiha hez dike ku bê navkirin) li pêşiya avahiya zanîngeha Portoyê (duyemîn bajarê mezin li Portugalê) dît, ew di nav xwendekarên portugalî de bû ku li dijî reformên hikûmetê protesto dikirin. Memo li Amedê ji dayîk bûye û li Stenbolê înformatîk dixwîne, ev bûn sê meh ku ew hatiye bajarê Portoyê, ji bo ku semesterekê li wir bixwîne. Derbarê programa Erasmûsê Memo wiha dibêje: "Pirr baş e ku hikûmet alîkariyê bide xwendekaran, ji bo ku tevlî vê programê bibin. Lê mixabin pirraniya xwendekarên Erasmûsê nayên vir ji bo ku xwendina xwe bikin û çanda xwe berfireh bikin, ew tenê ji bo herin şahiyan û ji bo vexwarina alkohohlê tên. Ji sedî 90ê wan tenê ji bo kêxweşiyê tên, ew weke tûrîstan diçin cîhên dîrokî û wêneyan ji xwe re dikşînin.

Memo bajarê Portoyê ji bo xwendina xwe hilbijart, ji ber ku ew ji avjeniyê pirr hez dike û dixwest okyanûsê bibîne, herwiha ji bo ku nêzîkî xwişka xwe bibe ku li paytext Lissabonê dijî. Hin hevalên wî yên kurd jî bi rêya bernameya Erasmûsê li Almanya û Polonyayê xwendina xwe dom dikin: "Ev cara yekemîn bû ku ez ji Tirkiyeyê derdikevim, ev jî fersendek baş bû ji bo naskirina çandên din, bajarên din û fêrbûna zimanên din."

Tirkiye bê Kurd û neteweyên din wê bibe sifir

Memo dema ku ji hevalên xwe re behsa Tirkiyeyê dike, zêde balê dikşîne ser pirsa kurdî li Bakurê Kurdistanê: "Tirkiye welatekî pirr mezin e, lê mezinbûna vî welatî ne tenê Tirk çêdikin, herwiha para gelê kurd jî heye, Ermenî û neteweyên din jî mezinahiya Tirkiyeyê ava kirine. Ku tu Kurdan û neteweyên din ji Tirkiyeyê derxînî, wê ev welat bibe sifir." Memo boçûnên xwe bi îngilîzî tîne ziman lê di nav axaftina xwe de peyvên kurdî bi lêv dike. Dema li Stembolê bû, ew diçû kursa zimanê kurdî û ji bo kurdiya xwe xurt bike herdem stranên hunermend û komên kurdî guhdar dike: "Ez herdem Şivan Perwer, Ciwan Haco, ku ez diramin ew yek ji mezintirîn hunermendên Rojhilata Navîn e, her wiha koma Agirê Jiyan û Koma Azad guhdar dikim".

"Li dîskotekan jî ez xwendekarên Ewropî fêrî dansa kurdî dikim."

Memo li pêşiya zanîngeha Porto

Di xwepêşandana li pêşiya avahiya zanîngeha Portoyê em pêrgî Siwar Mihemed jî hatin. Ew ji Rojavayê Kurdistanê, ji herêma Kurdaxê ye. Siwar li Spanyayê endezeya xwarinê dixwîne û ev bûn sê meh ku hatiye Portoyê. Siwar gellek çalakiyan çêdike ji bo ku çanda kurdî bide nasîn, bi kû ve herê, ew behsa Kurd û Kurdistanê dike. Çend caran jî di televîzyona portugalî de behsa êş û azara Kurdan kiriye, nemaze ya Kurdên Rojavayê Kurdistanê: "Kurd li vir tine ne û ti portugalî wan nas nakin. Ji ber wê jî çi fersend bi dest min dikeve, ez qala pirsa kurdî dikim, heyanî dema em diçin dîskotekan, yan jî şahiyên Erasmûsê, ez xwendekarên ewropî fêrî dansa kurdî dikim û em govendê digrin." Siwar boçûna xwe li ser xwendekarên Erasmûsê wiha tîne ziman: "Ev program fersendekê dide xwendekaran ku li kêleka xwendina xwe sûdê ji mayîna xwe li welatê mêvandar werbigrin, daku ziman û çandên nû nas bikin. Hinek vê fersendê bi dest dixin û xwe pêş dixin, hinek jî wextê xwe di tiştên vala de wenda dikin."

Xwedenkarên kurd dikarin roleke baş di danasîna çanda kurdî de bilîzin.

Siwar û li paş wî bajarê Porto

Siwar aşiqê vî bajarî bûye û hez dike bo demeke dirêj li vir bimîne. Ew dibêje ku Portugalî pirr dişibin Kurdan û ji ber wê ew pirr xerîbiyê hest nake: "Ez wiha hîs dikim weke ku ez di nav xelkê xwe de me". Siwar hêvî dike ku di navbera Kurdan de, nemaze Herêma Kurdistanê û Portugalê de, pêwendiyên çandî çêbibin: "Herdu netew xwedî çandên dewlemed in û divê em pirên hevaltiyê di navbera van herdu netewan de saz bikin" û wiha pêde diçe: "Xwedenkarên kurd dikarin roleke baş di danasîna çanda kurdî de bilîzin. Li vir xwendekarên ewropî di şahiyên Erasmûsê de xwarinên welatê xwe çêdikin û li ber maseyên xwe ala xwe radixînin, dansa xwe jî dikin û wiha çanda xwe bi xwendekarên din didin naskirin".

Cîhên Kurdan li Berlînê

Vîn Bîstro
Karl-Marx-Str. 210
12055 Berlin
Tel: 0176-79020404

Vîn Caffee
Karl-Marx-Str. 208
12055 Berlin
Tel: 0162-9457726

Yilmaz Obst & Gemüse Lieferservice
Karl-Marx-Str. 175
12043 Berlin
***Tel:** 0160-2640788*

Euro Apotheke
Kostenlose Lieferung
Karl-Marx-Str. 214
12055 Berlin
***Tel:** 030/76764858*

Xwaringeha LASAN
Adalbertstr. 96
10999 Berlin
***Tel:** 030/69814098*

Center Glaserei
Adalbertstr. 39
10179 Berlin
http://www.centerglas.de
***Tel:** 030 / 24 04 73 22*

Arîna Travel
Kottbusserstr. 3
10999 Berlin
***Tel:** 030-56976945*

Salar Service
Skalitzer Str.
10999 Berlin
***Tel:** 030-62901552*

Tîpa Mûzîkê Berlin
Nîwar û Ayad
***Tel:** 0172-4457307*
***Tel:** 0162-9457726*

Medya HD
Deng û Dîmen
Sonnelallee 95
12045 Berlin

HAN Grafik
***Tel:** 03047987052*
***Fax:** 030-47987054*
han-grafik@hotmail.de

Zahnarztpraxis
Dr. B. Mihmmud /
Dr. H. Scheusch
Kottbusser Str. 24
10999 Berlin
***Tel:** 030-6182894*

Gohdarz Hajo /
Cheirko Hajo
Emser Str. 26
12051 Berlin
***Tel:** 030-62845859*

Hawar Kadro
Alt-Moabit 84 a
10555 Berlin
***Tel:** 030-391 74 24*

Dr. Darius Dalmis
Prak. Arzt
Karl-Marx-Str. 215
12055 Berlin
***Tel:** 030-6822288*

Hûn jî dixwazin navê kargeha we di nav vê lîsteyê de be? Herwiha ji bo bajar û welatên din jî hûn dikarin serî li Rûdawê bidin. Bi Rûdawê re bikevin pêwendiyê.

www.arsivakurd.org

Tîma Kurdistan ji bo VIVA 2012 xwe amade dike

Kadroya Tîma Kurdistanê beriya maçên VIVA hinek tê guhertin û çend lîstikvanên nû zêde dibin

Hewlêr (Rûdaw) - Cîgirê rahênerê Tîma Kurdistanê, Semîr Babo diyar kir ku tîma Kurdistanê li bajarê Hewlêrê dest bi amadekariyên şampiyoniya VIVA kir.

Semîr Babo, ji AKnewsê re got ku Tîma Kurdistanê ji roja 29ê Gulanê ve li yarîgeha 2em a Frenso Herîrî ya Hewlêrê, yekemîn antrenmana xwe bo şampiyoniya VIVA li dar xist.

Babo got, "Antrenmana me wê heta destpêkirina maçên şampiyoniyê berdwam bin. Me hewl daye pêkhateyek baş bo tîma Kurdistanê destnîşan bikin. Em ê guhertineke biçûk di tîmê de bikin û wê çend rojên din hinek lîstikvanên me yên lîga Îraqê beşdarî tîmê bibin û bi giştî bibin 30 lîstikvan."

Cîgirê rahênerê tîma Kurdistanê ragihand, federasyona fûtbola Kurdistanê gellek alîkariya wan dike û azadiyeke mezin daye wan û got, "bo encamekî baş divê em xwe biwestînin."

Yariyên şampiyoniya VIVA ya welatên ne dewlet, wê di 4 Hezîranê de li bajarê Hewlêrê yê Herêma Kurdistanê dest pê bike û hefteyekê bidome.

Şaredariya Amedê alîkarî da klûbên amator

Baydemir di danîna alîkariya cil û bergên sporê de amade bû

Amed (Rûdaw) - Serokê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê Osman Baydemir tevlî çalakiya alîkariyê bû û destnîşankir ku li Amedê çi amator, çi profesyonel bi dehan klûbên sporê hene û got, "Divê em hewl bidin li her taxekê Amedê sporvanan derxînin û divê wisa taximeke Amedê hebe ku ji sedî 99 lîstikvanên wê Amedî bin."

Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê roja 28ê Gulanê di Salona Resepsiyonê ya Sumerbankê de bi beşdariya nûnerên 15 klûbên sporê yên amator komcivînek li dar xist û alîkariya maddî dane klûbên amator ku du ji wan klûbên kêmendaman in. Di komcivînê de Serokê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê Osman Baydemir, Serokê Klûba Diskisporê Haci Haspolat, Sekreterê giştî yê Yerel Gundem 21 Metin Kilavuz, Serokê Klûbên Mezopotamyayê Huseyin Kaya û nûnerên klûban û sporvan amade bûn.

Baydemir di komcivînê de beriya ku alîkariya maddî da bide nûnerên klûbên herêmî axaftinek kir. Baydemir daxuyand ku spor ji bo dermankirina birînên civakî çalakiyeke bi wate ye û got Amed di salên dawî de travmayê dikişîne. Baydemir wiha axivî: "Divê her taxekê Amedê bibe xwediyê aktivîteyên spor û her taxekê saheya wê ya futbolê, basketbolê û voleybolê hebe. Em wiha dikarin ji taxan lîstikvanên teze derxînin. Xeyalek me ya wisa heye: Divê taxima Amedê wisa be ku dema di lîga profesyonel de bileyîze divê ji sedî 99 lîstikvanên wê Amedî bin. Lewma divê em li her taxê saheyan ava bikin."

Klûbên ku alîkarî standin:

Klûba Sporê ya Koran a Amedê, Klûba Sporê ya Kerran a Amedê, Klûba Sporê ya Ciwanên Ertaş, Klûba Sporê ya Ciwanên Babacan, Klûba Sporê ya Altin Ayaklar, Klûba Sporê ya Amedê, Klûba Sporê ya Alipaşa , Klûba Sporê ya Xançepekê, Klûba Sporê ya Aştiyê, Klûba Sporê ya 1903 Kartal, Klûba Sporê ya Gaziler, Klûba Sporê ya Gundê Biçakçi, Klûba Sporê ya Taxa Sanayi, Klûba Sporê ya Îskanevleri, Klûba Sporê ya Yenikoy.

Alîkariya ku hate belavkirin ev bû: 20 heb eşofman, 20 heb solên krabon, 20 heb şort tişort, 20 adet gore, 10 heb gok, 10 qat cilên taekwondo, 12 heb lepik, 10 heb çente, 2 heb kask û cendîn tiştên parastina endamên laş.

Performansek xweş ji Tutumlu... ...lê bê xelat



Monako (Rûdaw) - Pîlotê Spanî yê esil Kurd Îsaac Tutumlu-Lopez, yek ji balkêştirîn beşdarvanên pêşbirka Porsche Supercup li Monakoyê bû. Piştî ku Tutumlu bêhtirî deh erebeyan li pey xwe hîştin, reqîbekî li erebeya wî xist û ziyanê gihand erebeya wî.

Pîlotê esil Kurd Îssac Tutumlu- Lopez (27 salî) di dawiya hefteya borî de bo cara yekemîn beşdarî pêşbirka Porsche Supercup li Monakoyê bûbû. Tutumlu vê carê erebeya Forch Racing by Lukas Motorsport dajot. Pîlotê Katalan vê carê li ser erebeya xwe, bi îngilîzî, nivîsandibû "Visit Kurdistan" ango serdana Kurdistanê bike.

Tê zanîn ku Tutumklu di Adara borî de li bajarê Îtalî Monza beşdarî Şampiyona Cîhanî ya Erebeyên Turîzmê (World Touring Car Championship) bûbû û li ser erebeya BMW 320 TC ya ekîba "Proteam Racing" ala Kurdistanê neqiş kiribû.

2 salî dest bi ajotinê kir

Isaac Tutumlu di 1985ê de ji dayîkek Katalan û bavê Kurd hatiye dinyayê û dema du salî bû dest bi ajotina erebeyên bo zarokan Go-Karts kir û di sala 1991ê de jî tevlî şampiyoniya Go-Karts ya Spanyayê bû. Di sala 1993ê de jî yekem şampiyoniya xwe ya sporê di Şampiyoniya Karting ya Spanyayê de gezenc kir.

www.arsivakurd.org

Hunermend Seîd Gabarî ji Rojavayê Kurdistanê ye, di salên 1970an de hejmareke zêde ya stranan li radyoya Bexdayê tomar kirin. Di salên 1980an de bi Erdewan Zaxoyî û Şakir Akreyî û çend hunermendên din re li çiyê Koma Şoreş damezrandin. Gellek salan bi stranên şoreşgerî û bi ahengên li deverên azadkirî yên Kurdistanê tevlî şoreşa Kurdistanê bûye. Di sala 2004ê de ji Almanyayê vegeriya û niha li Başûrê Kurdistanê dijî.

Wêne: Rûdaw

“Ez meleyê diwazde îlman im û min li hucreya Cegerxwîn xwendiye”

Rûdaw: Ti berhemeke nû li ber destê te heye?

Seîd Gabarî: Gelek berhemên nû li ber destê min hene, lê şiyana min ya tomarkirina wan tine. Wezareta Rewşenbîrî û Ciwanan soz dabû min tiştekî ji min re bike, lê heya vêga bersiv nedane min. Naxwazim jî berhemên xwe li studyoyên Tirkiyeyê bi baglemeyeke tirkî tomar bikim û bêjim min karekî nû kiriye, dixwazim stranên folklora kurdî nû bikim. Hinek hunermend hene, heya straneke kurdî dibêjin, 10 stranên tirkî û erebî dibêjin, ev rêznegirtina berhemên kurdî ye. Heya vêga min 111 stranên folklora kurdî bi dengekî modern û muzîka nû belav kirine.

Pêşî çavên te sax bûn, ji ber çi te bînahiya çavên xwe ji dest da?

Newêrim sedemên jidestdana bînahiya çavên xwe kifş bikim, lê di sala 1969ê de, gava temenê min 17 sal bû, min bînahiya çavên xwe ji dest da. Wê demê heya salekê tûşî nexweşiyeke derûnî bûm û rastî gel,ek kêşeyan hatim. Lê vêga ez xwe wek kor nahesibînim, ew kes kor e ku mejiyê wî seqet e û hişê wî tine. Kor dikare gellek tiştan bike ku dibe hinek kesên ne kor nikarin bikin. Wek mînak kak Yadgar berpirsê Komeleya Korên Kurdistanê ye, lê belê kolêja yasayê qedandiye.

Hûn demekê li Îraqê hatin girtin, li ser çi bû?

Du sal û heşt meh û 23 rojan li zindana Abu Xirêb bûm. Ev ji xeynî emniyeta bakur û emniyeta Kerkûkê. Ji ber ku welatînameya min ya îraqî nebû, ku wê demê rêxistineke swêdî pê hesiya, lewma hikûmeta Îraqê bi neçarî ez azad kirim, dûre ez radestî rêjîma dîktatorî ya Sûriyê kirim. 17 mehan jî li zindanên Sûriyê mam, dûre hatim azadkirin û gotin 73 saetan te hene ku tu ji Sûriyê derkevî. Êdî di sala 1989ê de, bi rêya Libnan û Îsraîlê reviyam û çûm Ewropayê.

Raya te li hember hunermendên ciwan çi ye?

Divê hunermendên ciwan di kelepûra me de melevan bin, vêce diçin cihekî din ji bo melevanîkirinê, beşekî zêde yê awazên welatên derdorê didizin. Di sala 1979ê de biraderekî kurd, naxwazim navê wî bêjim, stranek gotibû ku awaza wê yewnanî bû. Xwediyê awazê pê hesiya û doz li dijî wî vekir. Ew biraderê kurd ji bo beşdariya di ahengekê de çûbû Atînayê, ew li firokexaneyê hat girtin û jê re gotin doz li dijî te heye û te awaza filan hunermendî diziye. Vêga gellek stran awazên wan yewnanî ne, eger haya wan welatan ji hunera kurdî hebe, wê doza li dijî me vekin û piştrast im ku hunermendên me wê bên cezakirin.

Tê gotin berî ku hûn bibin hunermend, hûn feqe bûne û we li hucreyan dixwend?

Erê, ez meleyê diwazde îlman im, şagirtê Cegerxwîn û Tîrêj im, lê min nikaribû meletiyê bikim. Min edebiyata kurdî bi zaravê kurmancî li hucreya Cegerxwîn xwendiye, ligel zanista îslamî ku ji xeynî Quranê, me rêziman jî dixwend.

Heya niha we çend berhem tomar kirine?

Min 82 berhem tomar kirine, lê tenê 36 berhemên min diyar in û yên din winda bûn, ji ber ku di pêşmergetiyê de me bi şeş patrî û tomarekê ve stran tomar dikirin. Ji wir jî min dişand radyoya Dengê Kurdistan li çiyê. Wê demê jî radyoya me di hundirê mehekê de 4 caran cîhê xwe diguhert, ji çiyayekî bo yekî din, lewma zêdeyî 45 berhemên min winda bûn.

Di strana xwe ya dawî de we behsa reformê kiriye, ji ber çi we li ser vê mijarê strand?

Wek hunermend û pêşmergeyekî kevin divê nameyeke min hebe, naxwazim ji bo ti berpirsî, ezbenî û ez xulam û qurban bikim. Divê bi lawê kolanê re bim, bi wî karkerî re bim ku kirêya xaniyê wî nadinê. Roj bi roj temenê me ber bi avabûnê diçe, divê dîrok tiştekî ji me re binivîse.

Piştî stranê doz li dijî we hat vekirin, ev çawa bû?

Em çend kes bûn li Dihokê, li cihekî rûniştibûn. Ji bo xweşiya xwe min stranek li ser reformê got, min ew stran ne ji bo belavkirinê got, lê yek ji wan 5 kesên ku bi min re bûn, stran tomar kiribû, dûre sextekarî di stranê de kiribû û bi rêya montajê mijara wê ya serekî guherandibû. Min navê çend kesan behs kiribû, navê hunermend Cemîl Zikrî wek kesekî sitembar hatiye bilêvkirin. Lê hemû tişt xistiye ser Zikrî û navê kesên din rakiriye, lewma Cemîl Zikrî doz li dijî min vekir.

We daxwaza lêborînê jê kir?

Erê, min bi dehên caran daxwaza lêborînê jê kiriye û min jê re gotiye mebesta min ne ew bû, lê ji doza xwe nayê xwar.

Polîs ti caran nehatine we bigirin?

Na, polîs û asayiş min nagirin. Rojekê ber bi Dihokê diçûm, min ji endamekî hêzên ewlekariyê yên li ser xalên kontrolê re got fermana girtina min heye, çima hûn min nagirin? Wî got ez bi xwe te nagirim, bila cenabê dadwer bê û te bigire.

Hevpeyvîn: Barzan Mihemed

Di karnevala çandî de *Koma Dîlan* hebû!

Berlin (Rûdaw) - Heftiya borî 17. Karnevala Kulturên Cuda li Berlînê bi tevlîbûna gellek komên ji neteweyên cuda hat lidarxistin. Zêdeyî 70 hezar kes ji bo dîtina karnevalê hatibûn Hermannplatzê. Koma Dîlan jî nûnertiya Kurdan kir.

Sibeha roja yekşema 27ê Gulanê bi nîşandana govenda kurdî û dansa brezîlyayî festîvala kulturî dest bi bernameya xwe kir. Koma Kurdan coşek mezin nîşan da, bi muzîka resen û cil û bergên ji herçar parçeyên Kurdistanê, bi govend û dîlanên herêmên Kurdistanê, bala ewropî û gelên din kişandin ser xwe.

Evîn Koflî, ku yek ji berpirsiyarên Koma Dîlan e, ji Rûdawê re dilxweşiya xwe nîşan da û got, "xebateka neteweyî û xizmeteke mezin me kir û ev nîşandana huner û çanda Kurdan e. Bilindkirina ala Kurdistanê ji her tiştî girîngtir bû. Muzîk û cil û bergên me ji her çar parçeyên Kurdistanê bûn. Saleke din em ê baştir organîze bikin."

www.arsivakurd.org

Fîlmê kurdî li Cannesê xelata zêrîn stand

Koln (Rûdaw) - Fîlmê bi navê “Bêdeng” yê derhênerê kurd Rêzan Yaşilbaş di 65. Festîvala Fîlman a Cannesê de xelata Fîlmê Herî Baş yê Kurt stand.

65. Festîvala Fîlman a Cannesê bi dawî bû û derhênerekî kurd ê ji Amedê yê 35 salî xelata Palmiyeya Zêrîn ji bo fîlmê xwe yê kurt stand. Fîlmê Yaşilbaş yê bi navê “Bêdeng” mijara girtîgeha Amedê ya di salên 80yî de tîne ser perdeya spî û tenê 7 deqîqeyan didome. Di dema xelatdayînê de Rezan Yaşilbaş axivî û got: “Ez vê xelatê pêşkêşî hemû jinên bêdeng û yên bi tenê yên welatê xwe dikim.”

Belçim Bilgin û Rêzan Yeşilbaş li Cannesê bi hevre bûn

Di fîlm de Belçim Bilgin û Cem Bender rolên sereke dileyîzin. Jina kurd ya bi navê Zeynep dixwaze ji zilamê xwe yê girtî re coteke pêlavên nû bibe girtîgehê, lê rastî qedexeyan tê.

Yeşilbaş ji rojnameya Radikalê re daxuyand ku wî çîroka dê û bavê xwe kiriye fîlm.

Rêzan Yeşilbaş kî ye?

Di sala 1977ê de li Amedê hatiye dinyayê û di sala 2008ê de li Stenbolê Zanîngeha Marmarayê, beşa Sînema-TV xwend. Yeşilbaş di dema xwendekariya xwe de dest bi kişandina filmên kurt kir û piştî zanîngehê di kanala CNN Türk de, di beşa belgefîlman de dest bi kar kir. Beriya fîlmê “Bêdeng“ ku di sala 2011ê de kişand, berê jî “Hikûm" kişand. Herdu fîlmên wî jî di festîvalên fîlman de hatin nîşandan û xelat wergirtin. Ew niha asîstantiya derhênerê navdar Zeki Demirkubuz dike.

Sîrasê ermenî 76 sal berê bi kurdî nivîsandiye

Maşallah Dekak Amed

Nivîskarê ermenî Sîras Hmayak tam beriya 76 salan berhemên bi kurdî nivîsiye. Berhema ku di 1936ê de hatiye nivîsandin, wê ji nû ve li Amedê bê çapkirin. Bi çapa vê pirtûkê re Kurd wê Sîras ji nû ve nas bikin û ji çavkaniya hebra pênûsa Sîras şerbeta wêjeya kurdî vexwin.

Di dengbêjî û stranbêjiya kurdî de cîhê dengbêj û stranbêjên ermenî Karapêtê Xaço û Aram Tîgran tê zanîn. Qedr û qîmeta van herdu Ermeniyên dostên Kurdan her diçe zêdetir dibe û valahiya wan jî her diçe zêdetir li ber çavan dikeve. Ev herdu dengbêj û stranbêjên ermenî bûn yek ji stûnên mayîndekirina çand û hunera kurdî. Derkete holê ku di edebiyata kurdî de jî Ermeniyê bi navê Sîras, hema hema beriya hemû nivîskarên kurd ên salên 1900î, dest bi edebiyata kurdî kiriye. Nivîskarê ermenî Sîras, digel ku 76 sal berê berhemên xwe bi kurdî nivîsandine jî, heta niha Kurdan ew keşif nekiriye û kêm tê naskirinê. Sîras di cîhana wêjeya ermenî de gellekî bi qedr û qîmet e. Hema hema yek wêjehezekî ku wî nas neke tine ye. Lê haya Kurdan pirr dereng ji Sîras çêdibe. Qelema Sîras ewqas xurt e û ewqas xwedî helwesteke rewşenbîrane ye, ku ji ber xebata xwe gellek caran tê xelatkirin.

Nivîskar Sîras hêj di temenê ciwaniya xwe de hez ji kurdî dike. Bi taybetî jî berê xwe dide çîrokên gelêrî. Di 1934ê de berhema xwe ya ewil a bi kurmancî bi navê “Memê û Eyşê” dinivîse. Lê wê çaxê bi pênasa xwe ya nivîskarê H. Şavarş navê xwe di wêjeyê de dineqişîne. Di 1936ê de îcar berhema xwe ya bi kurmancî “Letîfe” dinivîse. Her çiqas di kurdî de berê xwe dide çîrokan jî, di nava Ermeniyan de bi romannûsiya xwe derdikeve pêş. Jiyana beriya şoreşê, jiyana civakî, dab û nêrît bi aliyên xwe yên berbiçav ve dibine mijarên romanên wî. Di 1931ê de romana wî ya bi navê Hartsirek Nrants (Ji Wan Bipirsin, Moskowa) hate weşandin, dûre jî ev romana wî di 1954ê de bi awayê xwe yê berfirehkirî ve, bi navê Nakhoryagîn (Roja Çûnî) hate weşandin. Romana wî ya bi navê Çikirvadz Orenk (Qanûna Nenivîsandî, 1936) pêwendiyên mirovan ên serdema pergala sosyalîst ji xwe re dike mijar. Wî ev romana xwe di 1940î de berfireh kiriye û bi navê Anahîd daye weşandin. Sîras di 1947ê de romana bi navê Hayr yev Vortî (Bav û Kur) û di 1950yî de ya bi navê Ararat nivîsiye, ku mijara wan Şerê Cîhanê yê Duyemîn û Ermenistan e. Weke van gellek berhemên din ên Sîras hene.

“Sîras 6 kurteçîrokên kurdî yên qerase nivîsandine”

Pirtûka kurteçîrokan a Sîras a bi navê Letîfe ji aliyê Weşanên Lîs ve tê çapkirin. Edîtoriya pirtûkê ji aliyê Kawa Nemir ve hate kirin. Pirtûk ji şeş kurteçîrokan pêk tê.

Kawa Nemir edîtoriya pirtûkê kir

Berhema hêja a nivîskarê ermenî, tam 76 sal piştre, careke din digihije ber destê xwînerên kurd. Edîtorê pirtûkê Kawa Nemir derbarê edebiyata Sîras de ji Rûdawê re axivî. Nemir destnîşan kir ti şik û guman tine ye ku Sîras nivîskarekî xurt e û bi taybetî jî di kurteçîrokan de gellekî serkeftî ye. Nemir da zanîn ku Sîras di edebiyata xwe de zimanekî pirr sade, lihevhatî û wêjeyî bi kar aniye û wiha got: “Berhema wî ya Letîfe xweş nîşanî me dide ku Sîras di kurteçîrokê de bêhnfireh, şareza û xwedî şiyaneke gewre ye. Sîras bi wî zimanê xwe yê hêsan, bi wateya ‘xwendinbariyê’ ve, hem ji aliyê şayesine fizîkî ve, hem jî ji aliyê dahûranên derûnî ve, bergehên berfireh û kûr li ber xwendevanan radixe.”

Jiyaneke taybet lê xwedî heybet

Nivîskar û zehmetkêşê rewşenbîriyê Sîras di 15ê Sibata 1902yê de li Zêdkana Qerekilîseya Bakurê Kurdistanê ji dayik dibe. Di sala 1914ê de bi malbata xwe re koçî Tiflîsa paytexta Gurcistanê dibe. Ew li vê derê di çapxaneyekê de cara ewil bi karê tîprêziyê berê xwe dide edebiyatê. Cîhê meraqê ye “Gelo ji ber ku ji edebiyatê hez dikir dest bi karê çapxaneyê kir, an bi karê çapxaneyê re ji edebiyatê hez kir?” Di sala 1921ê de Sîras li paytexta Ermenistanê Êrîvanê bi cîh dibe. Di navbera salên 1922-25ê de di Fakûlteya Dîrokê de dixwîne. Weke hevçaxên xwe ew jî li ber bayê komûnîzmê dikeve û di wê baweriyê de ye ku jiyan encax bi komûnîzmê dikare wekhevî û edaletê bîne. Ji ber vê yekê di 1924ê de dibe endamê Partiya Komûnîst a Yekîtiya Sovyetan. Di salên 1927-28ê û 1933ê de, di kovara Panvorê (Karker) de dest bi edîtoriyê dike. Sîras qîma xwe tenê bi xwendina dîrokê nayne û meraqa wî ya rojnamevaniyê jî çêdibe. Ji ber vê yekê di 1932yê de Enstîtuya Rojnamevaniyê ya Moskovayê jî diqedîne. Di navbera salên 1938-39ê de di kovara Sovedagan Kraganûtyûnê (Wêjeya Sovyetê) ya mehane de careke din wekî edîtor dest bi kar dike. Ew di navbera salên 1938-41ê û 1946-48ê de jî sekreteriya Desteya Rêveberiyê ya Yekîtiya Nivîskaran a Ermenistanê dike. Nivîskar Sîras di navbera salên 1941-45ê de di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de cîh digre û li eniyê şer dike. Piştî şer, di navbera salên 1954-57ê de, dîsa edîtoriya kovara Sovedagan Kraganûtyûnê dike. Jiyana Sîras heta 1983yê bi van tevlîhevî û têkoşîna jiyanê dewam dike û di vê salê de li Êrîvanê jiyana xwe ji dest dide.

Münevver Toktas
Parêzer - Rechtsanwältin
Reklam
Dadweriya Peymanên Kiryariyê | Kaufrecht
Dadweriya Kirê | Mietrecht
Dadweriya Peymanên tamîrat û nûjenkirinê | Werkvertragsrecht
Dadweriya Ticaretê û Şirketan | Handels- und Gesellschaftsrecht
Dadweriya Malbatî | Familienrecht
Dadweriya Trafîkê | Verkehrsrecht
Dadweriya Peymanên geşt û guzarê | Reiserecht
Dadweriya Birêvebirinê | Verwaltungsrecht
Dadweriya Mayîna li Welatekî | Aufenthaltsrecht
Viersenerstr. 2
50733 Köln
Tel.: 0221 16873630
Fax: 0221 16873631
Info@kanzlei-toktas.de
www.kanzlei-toktas.de

Parêzer Uzun
Buroya Parêzeriyê
Em li seranserê Almanyayê di xizmeta we de ne
Reklam
Beşên me yên kar
Dadweriya Kar (Arbeitsrecht)
Dadweriya Aborî (Wirtschaftrecht)
Dadweriya Trafîkê (Verkehrsrecht)
Dadweriya Werzîşê (Sportrecht)
Dadweriya Peymanê (Vertragsrecht)
Dadweriya berpirsiyariya pizîşkî (Arzthaftungsrecht)
Parêzer Oktay Uzun
Navnîşan:
Sonnemannstr. 3
60314 Frankfurt am Main
Tel.: 069 – 49 600 87
Fax: 069 – 49 600 88
email: info@kanzlei-uzun.de
web: www.kanzlei-uzun.de

Yekem car berpirsekî MHPyî daxuyaniyê dide rojnameyeke kurdî

Wênê: Rûdaw

Teror bi çekan bi dawî nabe, bi axaftinê çareser dibe

» Kurd û Tirk ji heman nîjadê ne, ango Tûranî ne

» Piştî ku Davutoglu bû wezîrê derve, siyaseta Tirkiyeyê ya derve bû emperyal

» Pirsgirêka Kurd tine ye, pirsgirêka Kurdçîtiyê heye

Di siyaseta Tirkiyeyê de, ji salên 70yî ve di hêla nijadperestiyê de partiyek bi nav û deng heye: MHP. Yek ji berpirsên vê partiyê û cîhgirê serokê koma meclîsê û parlementerê Mersînê, Mehmet Şandir, ji Rûdawê re daxuyand ku ew ne li dijî wê ne ku dewlet bi Mesûd Barzanî re hevdîtînê çedike. Şandir got, "Tişta ku me aciz dike ew e ku ji wê herêma ku Barzanî desthilatdar e, li dijî Tikiyeyê ev 25 sal in êrîşên çekdarî tên kirin. Gazinc û hêviya me ji Barzanî ew e ku pêşî li wan êrîşan bigire."

Şandir Kurd û Tirkan wek bira û ji heman nijadê dibîne û dibêje diviyabû Komara Tirkiyeyê ji roja pêşî ve Kurd û Tirkan wek bira diyar bikira û got, "divê Kurd û Tirk ji bo rêvebiriya hevbeş a bakurê Îraqê dilsoz bin." Bi baweriya Şandir li Tirkiyeyê pirsgirêka Kurd tine ye û tenê pirsgirêka Kurdçîtiyê heye û got, "Bi çekan dawî li terorê nayê, divê em çavkaniya wê bigirin û paşê rûnin hevdu himbêz bikin." Şandir herwiha got ku Alparslan Turkeş û Devlet Bahçeli bûne asteng ku alîgirên wan li dijî Kurdan bên bikaranîn.

Birêz Şandir, em dixwazim ji polîtîkaya AKPê ya derve dest pê bikim. Bi idiaya 'sifir pirsgirêk' dest bi kar kirin lê niha ligel Îranê, Îraqê û Sûriyê gellek pirsgirêk hene. Hûn vê siyasetê çawa dibînin?

Mehmet Şandir: Divê siyaseta dewletan ya derve li gor hikûmetan neyê guhertin, weke siyaseta dewletê bimîne. Ango nabe li gor AKPê, ya jî li gor MHPê siyaseta derve bê guhertin. Ev 10 sal in ku AKP dewleta me birêve dibe, bi taybetî jî piştî ku Ahmet Davutoglu bûye wezîrê derve, hewl dide xwe ku siyaset û konseptek nû bide siyaseta Tirkiyeyê ya derve. Mirov nikare bêje ku vî karî bi serkeftî dimeşînin, ji ber ku di encama vê siyasetê de em bi hemû cîranên xwe re bûne dijmin. Mînak hinek doz û xetên sor ên dewletan hene, mesela xetên sor yên Tirkiyeyê derbarê Îraqe de hene.

Çi ne ev xetên sor?

Parastina yekbûna dewlet û siyaseta Îraqê, xeta me ya sor a herî girîng e. Divê wek aliyên esas Ereb, Tirkmen û Kurd li ser bingeha makezagona Îraqê wekhev bên naskirin û rêvebiriyê parve bikin. Xaleke me ya sor ya din jî parvekirina wekhev ya dewlemendiyên Îraqê yên binerd e.

Gelo AKP ji vê siyaseta Tirkiyeyê dûr ketiye?

Berê Tirkiyeyê siyaseta xwe ya derve li Enqerê û bi rêbazeke navendî dimeşand. Ji dema Ataturk ve xalên me yen siyaseta derve diyarkirî ne. Ango aştiya li hundir û li derve. Ji dema damezirandina komarê ve ti carî Tirkiye di herêma xwe de nebûye aliyekî şer û pevçûnan. Eger hûn rabin van xalan biguherînin û pirsgirêkên bêçare yên dema Osmaniyan dîsa bînin holê, weke bi helwestên Osmaniyên nû, û hewl bidin ku herêmê kontrol bikin... ev siyaseteke şaş e. Milletê tirk ev hezar sal in ku li vê herêmê bi cîranên xwe re, bi Kurdan, Farisan, Ereban, Durziyan û Êzîdiyan re dijî. Di siyaseta Osmaniyan de zext li ser kultur, bawerî û hebûna miletên din nedihat kirin. Asîmîlasyon jî nedihat kirin. Dikarî vê siyaseta asîmîlasyonê bikira, lê nekir.

Di dema AKPê de çi tişt hatin guhertin?

Cudatiya duh û îro ev e: Berê siyaseteke me ya netewî û navendî ya Enqerê hebû. Piştî ku Davutoglu bû wezîrê derve, siyaseta Tirkiyeyê ya derve bû emperyal. Li vê herêmê, di vê demê de ,siyaseta emperyal ne rast e. Ji siyaseta sifir pirsgirêk em hatin siyaseta bi herkesî re pirsgirêk. Dostaniyeke me ya heta hetayê nema di vê herêmê de. Îro ligel Mesûd Barzanî tekiliyên baş dimeşînin, dibe ku sibê bê guhertin. Em baş dizanin ku serokwezîr Erdogan bi çi gotinan behsa Barzanî dikir, lê niha weke serokê dewletê pêşwaziya wî dikin.

Têkiliya ku bi birêz Barzanî re tê mesandin, gelo MHPê aciz dike?

Tişta ku em jê aciz dibin ew e ku 30 sal in ji wê herêma ku Barzanî kontrol dike, êrîş li dijî Tirkiyeyê tên kirin. Hêvî û gazincên me ji Barzanî ew in ku wan êrîşan bisekinîne. Em di vê mijarê de ti behaneyeke birêz Barzanî qebûl nakin.

Li bakurê Îraqê wê di bin serokatiya birêz Barzanî û birêz Talabanî de wê tiştên rast bên kirin

Ew jî dibêjin Qendîl herêmek fireh e, çiyayî û asê ye û em nikarin kontrol bikin.

Eger niyet hebe dikarin bi Tirkiyeyê re terorê paqij bikin. Dostaniya gelên herêmê pêwîst e; eger gelên herêmê nebin dost, wê kes di vî serî de bisernekeve, em ê hertim winda bikin û biyanî qezenc bikin. Lewma ez wek berpirsekî MHPê dibêjim ku berpirsiyariyeke Barzanî heye ku pêşî li êrîşên PKKê bigire. Eger bêje hêza min têr nake, bila alîkarî ji Tirkiyeyê bixwaze. Em wek MHP, hemû mirovên ku dibêjin em Kurd in, wek birayên xwe dibînin. Em ne kesûkar in, em bira ne û ji heman nîjadê ne, ango em Tûranî ne. Kurdên Îraqê jî birayên me ne, divê komara me ji serî de ev yek bigota. Diviyabû me çawa mafê Tirkmenên Kerkûkê diparast, me gerek mafê Kurdên Hewlêr û Silêmaniyê jî biparasta.

PKKê 25 salan xwîn rijand lê dîsa jî Tirkekî êrîşê cîranê xwe yê Kurd nekir. Serokê me yê berê Alparslan Turkeş û yê niha Devlet Bahçeli pêşî li ber şerê navxweyî girtin û nehîştin netewperestên me li dijî Kurdan bên bikaranîn.

Li gor we çareseriya vê pirsgirêkê çawa ye?

Li gor MHPê, ji bo çareseriya pirsgirêkê, bi hevkariyê divê em terora cudaxwaz bidawî bînin. Wisa bibe ku teror hêza xwe winda bike û nikaribe çek bikarbîne. Paşê divê em ligel hev rûnin û di dawiya 25 salên xwînrêj de, ji bo karibin hestên dijminatiyê ji holê rakin, dîsa bi hevkarî dest û dilê xwe bidin hevdu. MHP dema ku bibe desthilatdar, di demeke kurt de wê wiha bike. Ew qaçaxçiyê li ser sînore Colemêrg û Qilabanê jî kurê me ye û leşkerê ku tê kuştin jî kurê me ye. Divê em mirovên ku li vî welatî dijîn bikin bira, daku hevdu hembêz bikin.

Li gor we pirsgirêka Kurd tine ye?

Na, li gor me pirsgirêka Kurd tine ye, pirsgirêka Kurdçîtiyê heye. Pirsgirêka wan aliyan heye ku hewl didin Kurdan ji Tirkan veqetînin û dewletek cuda damezirînin. Ev pirsgirêk ne ya Kurdan e, ya Îngilizan e û ya hêzen global e. Di vê herêmê de ji bo damezrandina Îsraîlek duyemîn mixabin Kurd tên bikaranîn. Mînak komara tirk ya ku nû hatibû damezirandin bi serhildana Şêx Seîd re mijûl kirin û Mûsil ji destê me standin. Lê eger Mûsil di destê me de mabûya, Kerkûk, Hewlêr û Silêmanî girêdayî Tirkiyeyê bûna, emê Tirk û Kurd bihevre wek xwediye petrolê bibûna bixwaztek mezin a bihêz. Wê rewş û jiyana me jî pirr baş bûya. Pirsgirêka PKKê li vê herêmê pirsgirêka her kesî ye. Divê em terorê biqedînin û paşê jî rûnin biaxivin.

Hûnê çawa çareser bikin?

Bi axaftinê emê çareser bikin, terorê jî emê bi axaftinê biqedînin. Bi çekan teror naqede, divê hûn çavkaniya wê bigirin û bitefînin. Dema me got emê terora cudaxwaz bi dawî bînin, em bi dawî tînin.

Hûn li meclisê li kêleka BDPyiyan rûdinên. Di navbera we de qet pirsgirêk derdikevin?

Na pirsgirêk di navbera me de tine ye, lê carinan hin gotinên şaş dikin. Perçebûna vî welatî bi kêrî ti kesî nayê. Dibe ku rayedarên dewletê kemasî kiribin, lê tenê ji Kurdan re na, ji her kesî re kirine. Eger em demokrasiyê pêkbînin, wê rê li pêşiya hemû kêmasiyan bê girtin. Lewma divê beriya her tiştî teror ji holê rabe. Pirr zarokên me şehîd dikevin, dilê me dişewite, PKKyî jî dimirin, ew jî zarokên vî welatî ne. Li hinek deran tê gotin ku eger MHP bibe desthilatdar wê Kurd nehêle. Ev tiştekî şaş e, ma em dîn in? Ez dubare dikim, Kurd birayên me ne. Di nava her malbatê de pevçûn çêdibe, em êdî dawî li şer bînin.

Tê gotin ku wê Îraq bibe sê perçe û Kurdistan ava bibe. Ligel avabûna Kurdistanê helwesta we çawa ye?

Ez di wê baweriyê de me ku şaşitiyek wisa nayê kirin. Kes nizane ka sert û rewş çi tînin, çi dibin, lê bê piştgiriya Tirkiyeyê li bakure Îraqê berdewamiya dewletek kurdî ne mimkin e. Wê li destên xelkê mêze bikin, heyf e. Di şûna bindestiya Amerîkayê de bi Tirkan re û bi Ereban re bijîn baştir e.

Hûn derbarê egera perçebûna Îraqê û li bakurê wir federasyona Kurdan û Tirkmenan bi Tirkiyeyê re dikarin çi bêjin?

Rûpela --> 12

www.arsivakurd.org

Banka navendî ya Îraqê: Nirxê 1 Dolarî dikin hezar Dînar

Di Gulanê de bazirganên Dolar li Hewlêrê zererek mezin kirin

Barzan Mihemed

“Dolar difiroşin” ev gotina pirraniya dolarfiroşên bazara Dolaran li Hewlêrê bû, ku ji rêbwaran re digotin, lê ev dîmen berovajiya çend heftiyên berê yên heman bazarê ye, ku digotin “Dolar dikirin.”

Hinek dolarfiroşên bajarê Hewlêrê ji ber bilindbûn û daketina Dolaran di çend heftiyên borî de ziyaneke mezin xwarine, nemaze yên ku di dema bilindbûna nirxê wan de, gellek Dolar kirîn. Dolarfiroşên bazarê zirara veguhertina Dolaran di vê dema kurt de wek milyar Dînar texmîn dikin.

Heya berî şeş heftiyan nirxê Dolar li bazarê 120 hezar Dînar bûn, lê ji nişka ve nirxê Dolaran bilind bû, bi awayekî roja 17ê Nîsanê nirxê 100 Dolarên Amerîkî bi 130 hezar Dînarên Îraqî bû. Lê piştî rojekê gava banka navendî ya Îraqê rêjeyeke zêde ya Dolaran xist bazarê, nirxê 100 Dolarên Amerîkî daket 123 hezar Dînarên Îraqî.

Banka navendî 265 milyon dolar xistin bazarê

Heya 17ê Gulanê nirxê Dolar roj bi roj bilind dibû, di hinek rojan de nirxê wê gihişt 130 hezar Dînaran, dû re daket û bû 128 hezar û demekê wisa ma, di 18ê vê mehê de ji ber banka navendî ya Îraqê Dolar xistin bazarê nirxê wê ji 128 hezar Dînaran di cih de daket 123 hezar Dînaran.

Ev bilindbûn û daketin ku di demeke kurt de rû da ziyaneke mezin gihand bazirganên Dolar, hinek dolarfiroş wek bi xwe behs dikin, kirîn û firotina xwe rawestandin û pereyên xwe li mal danîne heya ku nirxê Dolar cihgirtî dibe.

Serokê Civata Dolarfiroşan li sûka Hewlêrê Husên Mihemed got: “Roja 18ê Gulanê banka navendî ya Îraqê li ser hev 265 milyon Dolar xistin bazarê, lewma di cih de nirxê Dolar ji 128 hezaran daket 123 hezaran, û vê yekê xisareke mezin gihand bazirganan.”

Deh dolarfiroş li Hewlêrê 40 milyon Dînar

Wek Husên behs kir, 10 bazirganên Dolar li sûka Hewlêrê di hundirê vê mehê de her yekî bi 40 milyon Dînaran xisar kir, ji bilî dolarfiroşan ku hinekan bi 3-4 milyon Dînaran zirar kir, bi texmîna Husên di wê dema kêm de: “Dolarfiroşên Hewlêrê milyarek Dînar xisar kirin.”

Di nav dolarfiroşan de behsa destêwerdana serokwezîrê Îraqê Nûrî Malikî di karûbarên banka navendî ya Îraqê de tê kirin û qaşo ji aliyê çend bankên ji xwe nêzîk banka navendî zeft kiriye û ew bank jî Dolaran bi keyfa xwe dixin bazarê.

“Bankên nêzîkî Malikî qezenceke mezin kirin”

Arif Kemal, xwediyê ofîsa Arif ji bo veguhertina Dolaran, ku 21 sal in vî karî dike, got: “Pêşî banka navendî Dolar bi rêya 80 bankan dixistin bazarê, lê di dema borî de Malikî dest danî ser banka navendî û çend bank hilbijartin ku Dolaran bi rêya wan bixe bazarê, lê wan bankan Dolarek nexistin bazarê, hinek Dolar jî ji bazarê kirîn, gava Dolar gihişt 130 hezaran dest bi firotinê kirin.”

Bazirganên veguhertina Dolaran dibêjin wan bankan Dolar bi 117,900 ji banka navendî wergirtine, lê bi nirxê bazarê dane bazirganan, da ku plana wan kifş nebe, banka navendî gellek dolar xistin sûkê û nirxê Dolar di cih de daket 123 hezar dînaran.

Xwediyê ofîsa Arif wiha axivî: “Hinek dolarfiroş hene dolar bi 119 hezar dînaran firotine, piştî çend rojan Dolar bilind bûye heya 129 hezar Dînaran, vê yekê jî wisa kir ku her bazirganek ji her 10 hezar dolaran, milyonek dînar zirarê bike.”

Dolarfiroş dibêjin, di dema bilindbûna Dolar de, çendîn kêşeyên civakî di navbera dolarfiroşên Hewlêrê de derketin. Husên dibêje hinek dolarfiroş hene çend saetan berî bilindbûna dolaran li bazarê dolar bi 120 hezar Dînaran firotine dolarfiroşekî din, ku Dolar bilind bûye jê poşman bûye û kêşe di navbera wan de derketiye: “Du kêşeyên bi vî rengî hebûn, lê me ew li hev anîn û nehişt kêşe mezintir bibe, me zirar jî di navbera wan de kir bi nîvî.”

Malikî banka navemdî di berjewendiyên xwe de bikartîne

Beşek ji parlamenterên Îraqê jî, dilgiran in ku serokwezîrê Îraqê Nûrî Malikî, banka navendî kontrol kiriye û di berjewendiya xwe de bikar tîne, digel ku ev bank desteyeke serbixwe ye û girêdayî parlamentoyê ye.

Berdevka lîsteya Iraqiye Meysun Demelucî ji Rûdawê re ragihand, ew dilgiran in ku Malikî, dest daniye ser banka navendî ya Îraqê, mebesta wî jî ew e ku dixwaze dest deyne ser diravê yedek yê wê bankê.

Li gor amara banka navendî ya Îraqê, 50 bankên hikûmî û sivîl li Îraqê hene û mafê hemûyan jî heye Dolaran bi rêya muzayede ji banka navendî bikirin.

Bank divê ji 100 Dolarî 10 Dînar qezenc wergirin

Cîgirê parêzgarê banka navendî ya Îraqê Mezher Salih ji Rûdawê re daxuyand, her bankek ji bo dema mehekê tevî wê muzayedê nebe û dolaran nekire, navê wê ji nav lîsteya wan 50 bankan tê derxistin û Dolaran wernagire.

Mezher Salih, bilindbûn û nizimbûna dolar bi planeke derveyî li dijî dînarê Îraqê ve girêdide û dibêje: “Kêşeya ku di dema borî de rû da, êrîşeke derveyî bû, da ku nirxê dînar bişkînin, bankan jî ev derfet bikar anîn û ji bo her 100 dolarî 10 hezar Dînar qezenc wergirtin li bazarê, di demekê de li gor rêbazên me nabe ji bo firotina her Dolarekî zêdeyî 10 Dînaran qezanc wergirin.”

Mezher dibêje, ewê tedbîrên xwe bigirin li hember wan bankan: “Plana me heye nirxê Dolar daxînin, bi awayekî ku nirxê Dolarekî dikin hezar Dînarên Îraqî.”

... dewama rûpela 11ê

Desthilatdarî û rêveberiyên Sunniyan nabin mayînde û aştiyê jî pêknayînin. Divê Kurd û Tirkmenên bakurê Îraqê helwesta xwe ya revebiriya hevbeş bi dilsozî nîşan bidin. Ez nabejim ev kar bila bi garantoriya Tirkiyeyê be, lê hevkariya Kurd û Tirkmenan li wê navçeyê bo berjewendiyên Tirkiyeyê jî baş e. Ji serdema Saddam ve ez dişopînim ku desthilatdar bi dostanî nêzî Tirkmenan nabin; Kurd jî wisa nêzîk dibin, Barzanî û Talabanî jî. Lê ez bawer dikim ku li bakurê Îraqê wê di bin serokatiya birêz Barzanî û birêz Talabanî de wê tiştên rast bên kirin.

Kurd dixwazin di nava yekîtiya Tirkiyeyê de mafê perwerdeya bi zimanê zikmakî bidestbînin, gelo nêzîkatiya we çawa ye?

Miletî tirk ne tiştek etnîkî û nijadî ye, ji wan civakan pêk tê ku bi hemû cudahiyên xwe ji duh heta îro bihev re jiyane. Yekîtiyeke sosyolojîk e û kulturî ye. Di nava miletê tirk de Kurd jî hene, Gurcî jî hene, Çerkez jî hene. Piştî hemû cudahiyên xwe, eger em nasnameya tirkî bipejirînin, ti pirsgirêk dernakeve. Zimanê fermî yê dewletê tirkî ye, ji bilî wî her kes wê fêrî zimanê xwe bibe û bide fêrkirin. Axaftin û fêrbûna zimanê zikmakî mafekî mirovahiyê ye, lê bi zimanê zikmakî perwerde tiştekî şaş e, em daxwazeke wisa rast nabînin.

> **Çawa mafê Tirkmenên Kerkûkê diparast, me gerek mafê Kurdên Hewlêr û Silêmaniyê jî biparasta.**

Çima hûn daxwazeke rast nabînin?

Wateya wê ev e, dema hûn wiha bêjin, ango hûn dixwazin miletekî biafirînin û paşê dewletekê ava bikin û xelkê li dora wî zimanî bicivînin. Ev jî dibe cudaxwazî.

Hûn perwerdeya bi kurdî li Tirkiyeyê qebûl nakin, lê ji bo Tirkên Bulgaristanê wî tiştî dixwazin, gelo ev jî rast e?

Binêrin, Tirkên Bulgaristanê ji nijada me ne, lê ne di nava miletê me de ne. Dibe ku em û Kurdan ne ji heman nijadê bin, lê em heman milet in. Divê em van herduyan tevlîhev nekin. Dema di sala 2001-2002yê de em desthilatdar bûn, me mafê axaftin û bikaranîna zimanê herêmê pejirand.

Hevpeyvîn: Kemal Avci

www.arsivakurd.org

Hevjîna Serokê Şaredariya Amedê, Reyhan Yalçindag Baydemîr:

700 zarokên kurd di zindanan de girtî ne

Wêne: Rûdaw

Reyhan Yalçindag li Hewlêrê tevlî Konferansa Jinên Kurdistanê bû

Hêmin Xoşnaw

Hevjîna serokê şaredariya mezin a Amedê Osman Baydemîr, Reyhan Yalçindag Baydemir, dibêje jina kurd li Bakurê Kurdistanê li gor navçeyên din yên Tirkiyeyê kêmtir rastî şîdetê tê. Herwiha ew kêfxweş e ku hevjînê wê "hezkiriyê xelkê" ye.

Reyhan Yalçindag Baydemîr, ji xeynî ku hevjîna Osman Baydemir e, wek çalakvaneke diyar ya mafên mirovan û parêzereke mafê jin û zarokan jî tê naskirin. Wê di salên 1990î de Fakulteya Huqûqê li Zanîngeha Dîcle li Amedê xilas kiriye. Dûre wek karmendeke diyar ya rêxistina mafê mirovan di ÎHD-ê de kar kiriye. Wê dema ku Osman Baydemir serokê ÎHD-ê bû li Amedê, bi hev re derbarê tawanên kiryar nediyar, şewitandina gundan û binpêkirinên din yên mafê mirovan kar kirine.

"Konferansa Hewlêrê girîng bû"

Reyhan Yalçindag Baydemîr yek ji beşdarên duyemîn konferansa neteweyî ya jinên Kurdistanê bû ku rojên 22-24ê Gulanê li bajarê Hewlêrê hat sazkirin. Baydemîr vê konferansê ji bo çarenivîsa jina kurd girîng dibîne û dibêje: "Piştî proseya parçekirin û jihevcudakirina me, ji nû ve hevnasîn girîng e. Êdî jina kurd nema wek wê jinê tê naskirin ku li jêr navê namûsê tê kuştin û bi saxîtî tê binax kirin. Jin di vê konferansê de tenê behsa kêşeyên xwe nake, lê li dû çareserkirina kêşeyan digere."

Bi hênceta avêtina keviran û beşdariya di xwenîşandanên ne moletkirî de û her kes dizane di zindanan de çi tê serê wan.

Derbarê ezmûn û şiyana beşdarên konferansê de jî, Reyhan Yalçindag Baydemîr got: "Di vî alî de konferans dewlemend bû. Hinek beşdarên konferansê heya doh pêşmerge bûn û îro siyasetê dikin. Hinek ji wan gerîlla bûn, hinek ji wan jî du ger in li parlementoya Tirkiyeyê kar dikin, lê pêwîst e hevdengî bibe rastiya jina kurd."

Jinên Bakur ji yên Tirkiyeyê kêmtir rastî şîdetê tên

Bi baweriya Reyhan Baydemîr, jinên kurd li Bakurê Kurdistanê di aliyê hişyarbûn û beşdariya çalakiyên siyasî û sivîl de gavên baş avêtine, lê hê jî ne dûr in ji kevneşopiyan û heya vêga jî li hinek deverên Bakurê Kurdistanê jin li ser namûsê tên kuştin. Lê gava rewşa jinên kurd dide ber ya jinên Tirk, geşbîn dibe û dibêje: "Li gor amarên fermî, şîdet li dijî jinan li Bakurê Kurdistanê li gor bajarên Tirkiyeyê kêmtir bûye, ev jî ji ber jîrbûna jina kurd û rêkxistina wê."

Reyhan Yalçindag Baydemir wek parêzereke mafê zarokan li Amed û Bakurê Kurdistanê tê naskirin, niha jî berevaniya çend zarokên girtî girtiye stuyê xwe. Baydemîr behsa jiyana zarokên kurd dike û dibêje bextreşiyên zarokên Kurdan ne kêmî bextreşiyên dayikên kurd e: "Gundên zarokan hatine xerakirin, ji ber hejariyê dinalin û di temenekî biçûk de ji bo peydakirina debara jiyana xwe kar dikin. Herwiha zarokên kurd bêpar nebûn ji wê nerewatiya siyasî ku dijî Kurdan tê kirin, bi hênceta avêtina keviran û beşdariya di xwenîşandanên ne moletkirî de û her kes dizane di zindanan de çi tê serê wan." Derbarê hejmara zarokên kurd ku niha di zindanên Tirkiyeyê de ne, Reyhan Yalçindag Baydemir got: "Roj bi roj hejmara wan zêde dibe. Îsal pîrozkirina Newrozê hat qedexekirin, gava zarokan guh neda qedexekirine, hejmara wan li zindanan zêdetir bû. Bawer dikim 700 zarokên kurd di zindanan de ne."

"Rexneyan li Osman digirim"

Reyhan hevjîna siyasetvan û berpirsekî kurd e û pirr caran medyaya Tirkiyeyê behsa wê yekê dike ku jina Osman Baydemîr rexneyan li daxuyanî û kiryarên mêrê xwe digire. Reyhan Baydemîr mikur tê ku berpirsiyarî û nebûna dema mêrê wê bara wê giran kiriye: "Kesê ku berpirsyariyeke mezin di stuyê wî de ye, li mal ne kesekî asayî ye. Zarokên xwe wek pêwîst nabîne, lewma berpirsyariya dayikê zêdetir dibe. Lê serbilind im ku jina Baydemîr im. Ji ber ku xelk jê razî ye, xwe ji bo karê miletekî hejar û belengaz terxan kiriye." Reyhan Baydemîr dibêje ku tecrûbeyeke hevbeş ya wê û hevjînê wê Osman derbarê şopandina karesatên Kurdan heye û wiha dom dike: "Em hest bi berpirsyariya hev dikin. Em ne tenê mêr û jin in, lê hevalên hev in. Rexneyên min li Osman derbarê wê yekê ne, ji ber çi tiştan di nava xwe de dihêle. Jê re dibêjim rast e tu siyasetvanî û barê te giran e, lê divê xwîna te sar be û xwe ji heyecanê biparêzî."

Şirove

Konferansa bi pirsgirêk ya jinan

Taman Şakir

Berê jinan tenê ji bo çareseriya kêşeya jinan û kêşeyên civakî panel û konferans girêdidan, pirraniya beşdaran jî jinên di nav partiyan de bûn, di rewşekê de wan dikaribû rasterast wan daxwazan ji partiyên xwe bikin. Lê jinên partiyan pirrî caran sergermiyek ji bo xwe û ji bo beşekî din yên jinan derdixistin, di dawî de jî çend tawsiye dihatin nivîsandin, ji hikûmet û partiyan re dihatin şandin. Ew semîner û konferans jî ne bêyî kêşe bûn û hinek mijûlên axaftinê bûn û hinek jî bi tiştên din ve mijûl bûn, tenê roja yekem û saeta yekem li salonan diciviyan. Jinên Kurdistanê di van rojan de duyemîn konferansa xwe ya neteweyî li Hewlêrê saz kirin, ji dêvla siyasetvanên mêr ku demeke dirêj e nikarin kongreya neteweyî girêbidin ji ber gellek sedemên navxweyî û derveyî, bi baweriya mêran konferansa neteweyî ya jinan hêsantir û bê kêşetir dibe, her ji serî ve çend aliyan kongreyê boykot kirin. Aliyekî din xwe wek pirraniyê dibîne û dixwaze tenê ew serkêş be û tevahiya biryar û tawsiyên kongrê bi kêfa wî bin, aliyê başûr jî bi jin û afiret û xweşik û hevre di hevrikiyeke siyasî de dijîn, yanî Kurd hemû di hevrikiya siyasî de dijîn, ne ji bo Kurdistanê lê ji bo desthilatê.

Jinan dikaribû daxwazên xwe di du xalên serekî de kom bikin, bêyî ku şer li ser ti kesî bikin.

Jinan dikaribû daxwazên xwe di du xalên serekî de kom bikin, bêyî ku şer li ser ti kesî bikin.

Mafê jinan beşdariya wan di çalakiyên siyasî û civakî û aborî û rewşenbîrî de û sererastkirin û nivîsîna wê pêwendiya paşketî di navbera jin û mêran de heye û siyaseta jênderî bê pêrewkirin û her yek ji jin û mêran derfeta wan hebe ku di nivîsîna destûr û wergirtina postên siyasî de beşdar bin, eger ev siyaset hat pêrewkirin serokê hikûmeta Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî ji dêvla ku ev hemû mêr di kabîneya wî de bin, wek Hollandê Fransî 17 wezîrên jin di kabîneya xwe de datîne ji dêvla jinekê.

Xala duyem a azadiya jinê di kar û fikir de, eger xala yekê girîng be xala duyem girîngtir e. Ji ber ku azadiya fikrî ya jinê dibe sedemê çareserkirina beşekî zêde yê kêşeyan, ji ber ku serdema em tê de dijîn, serdema xistina bazarê ya laş û girîngî dana bi aliyên ne girîng yên jiyanê, li pirraniya rojname û malperên înternetê beşê jinan zêdetir xwe ciwankirin, nîşandana cil û bergan, makyajkirin û derxistina cilên jêr û pêşbirkiya şah ciwanan e. Li vir jin nikare guh bidin aliyê xwe yê fikrî û wek mirov tev bigerin lê wek mê tevdigerin û bi baweriya wan ew bazara jê re hatiye amadekirin cihê girîngiya wan e, girîngî dana bi van xalan jî me ji tiştên cewherî dûr dixe. Lewma girêdana bi panel û konferansan û damezrandina sedan rêxistin û dezgehên din kêşeyên ne ku Kurdan, lê kêşeyên jinan jî bi tenê çareser nakin, eger em ji bingeh ve ol û sîstema siyasî û hizbî ya Kurdistanê reform nekin kêşeyên me yên siyasî bê piştgir dimînin. Bêguman takekesê azad dikare hest bi berpirsiya neteweyî bike, piştgiriya biryara neteweyî bike, ne ku takekesên ku partiyan mejiyê wan dagir kirine û hemû Kurdistanê di kesekî de dibînin.

Pirsgirêka Kurd, ol û nîjadperestiya desthilatê – II *

Selahattin Çelik

Herçiqas dewleta tirk di damezrandina xwe de pergaleke laîkî pejirandibû jî, di kirdariyê de bi awayekî kevneperest ol, ango Îslam, bi kar dianî. Ol di bin kontrola dewletê, bi gotinên rasttir, di bin rêvebiriya dezgeha şerê taybet (ÖHD) de bû. Weke mînak, dezgeha karûbarê olî "Diyanet" bi xwe dezgeheka ÖHD bû û li himberî baweriyên din û Kurdan xwedî dîrokeke qirêj e.

Li Kurdistanê li ser qada olî ev kontrol dijwartir e. Dezgeha sîxuriyê ya Tirkiyeyê MÎTê û miftiyên Diyanetê ev kar bi awayekî fermî û eşkere dianîn cîh. Li gellek herêmên Kurdan dibistanên olî yên kevneşop hebûn. Di wan de perwerde bi zimanê kurdî dibû û feqeyên wan Kurdperwer bûn. Lê hemû, yek bi yek, hatin girtin û qedexekirin.

Dewletê di qada ronakbiriyê de jî hevkariya Îslamê dikir, rûdan û pêşveçûn di nav baskên xwe di dihiştin. Ewilî Komela Tekoşîna Dijkomûnîzmê (KTDK, 1956) hat damezrandin. Serokê Cuntaya 1960ê, Cemal Gûrsel, serokê rûmetî ye komeleyê bû. Fethullah Gulen ê nasnav jî di nav damezrênerên KTDKya Erziromê de bû. Di zanîngehan de gellek xortên kurd jî, bi navê Îslamê, ketin xefika KTDK û di dawiyê de bi bîrdozî û siyasî hatin pişaftin. Hinek ji wan weke kadro li Kurdistanê bûn pêşengên kevneşopeke gellekî ruxîner.

Komela Rewşenbiran, mîrat û kevneşopiya KTDK girt (14.05.1970). Komel bi navê Forma Nû (Yeni Form) xwedî kovarek û xwedî gellek şirketên çapemeniyê bû. Senteza Tirk-Îslam berhema Komela Rewşenbîran e. Sentezê Tirkbûyîn li ser Îslambûnê digirt, ango mebest tirkkirina Îslamê bû. Anjî ji bo berjewendiyên nîjada tirk, Îslam weke navgineke bîrdozîpolîtîk dihat bikaranîn. Êrê Îslam hebû, lê Îslameke tirkperest bû. Ji ber wê yekê senteza Tirk-Îslam konsepteke nîjadperest bû. Komela Rewşenbîran dijwar dewletperest bû. Têkiliyên wê bi ÖHD re eşkere bûn. Komelê, di serdema Şere Sar de (1946-1989), di konsepta Hawirdora Kesk de jî cîh girtibû. Tê zanîn ku pereyên vê konseptê ji aliyê Erebistana Siûdî û CIA dihat dabînkirin.

Çima li ser vê komeleyê hewqasî disekinim? Ji ber ku di siyaseta Tirkiyeyê de bandora wê mezin e. Ji bo kadroyên dewletê yên sereke û partiyên rastgir, bi taybetî jî ji bo MHPê, çavkaniya bîrdoziya nîjadperest bû. Komelê şert û mercên hikûmetên koalîsyonên rastgir amade dikir, pêşnûmeya makezagona leşkerî ya 12.09.1980ê jî amade kiribû.

Ji 1984ê ve komeleyê giraniya xebata xwe da dijayetiya tekoşîna kurd. Kovara komelê "Forma Nû" pelên xwe ji tilîkeşên JÎTEMê re vedikir. Yek ji wan Abdulkadir Aygan bû. Komelê di salên dawî de mode şopand, bi neo-neteweperest û neo-nîjadperestan re, weke Sevasor, ket nav hevbendiyan. Hişmendî û feraseta hevbendiyê gellekî fireh bû; divê li dijî Kurdan bûna.

Li vir divê mirov qala bizava îslamî ya tirk bike. Bizava îslamî, qels an jî zexm, hertim hebû û dixwest bibe desthilatdar û li himberî bijarêyên artêş û burokrasiyê di nav tekoşîne de bû. Lê eger qala nêrîna wan derbarê Kurdan de bikim; di ola wan de cîhê Kurdan, mafên Kurdan bi netewî, qet tine bûn. Çîrok tê zanîn, êdî weke benîşt bû: "Biratiya îslamî", weke "biratiya sosyalîst" anjî ya çepgiran. Wan tenê dixwestin bibin desthilatdar. Ne li dijê bîrdozî û dezgehên dewletê bûn, dixwestin tenê wan bixin destên xwe de. Heya bigihin armanca xwe, eger pêwîst bûya, zordariya li ser Kurdan dianîn ziman û hemû hewqas. Di salên 1970an de, li Tirkiyeyê di nav civakê de şiyarbûneke bîrdozî û siyasî çebû, tevgereka girseyî ya çînî destpêkir. Berhemên pevajoyê, ji rastgirên tundrew heya yên çepgir, pirrbûna tevger û partiyên siyasî bûn. Partî û komeleyên îslamî jî zêde bûn. Wan li Kurdistanê jî tov dan, lê ne di asta yên çepgir û Kurdparêz de. Li bajarên Kurdan komên îslamî yên polîtîk ji xortan pêk dihatin, ew peyrewên endamên KTDK bûn. Bi zêdeyî ji komela Yekîtiya Xwendevanên Tirk ên Netewî (MTTB) û Akinciyan dihatin. Ev li Kurdistanê diyardeyeke nû bû. Lê ti têkiliya wan bi mîrat û kevneşopiya Şex Seîd anjî Mistefa Barzanî tine bû. Bi komên Misilmanên welatparêz û kevneşop re jî têkiliyên wan tine bû. Têkiliyên wan bi doza Kurd qet tine bû. Bi awayekî eşkere û misoger dibêjim; ji nîjada Kurd bûn, li ser xaka Kurdan bûn, lê bi bîrdozî, hişmendî, siyaset û tevgera xwe biyanî bûn. Li ser navê Îslamê be jî, berhemên ruxandina dewleta tirk bûn. Mînaka berbiçav Hizbullah bû. Ti têkiliyên wê bi nirxên gelê kurd re tine bû. Ji wê yekê wisa bi hêsanî bû leyistoka dezgehên sîxuriyê yên dewletê û bû sedemê hewqas kuştin û ruxandinê. Îro êdî eşkere ye ku Hizbullah karesatek bû. Bi birdozî û bi siyasî, sedased çewtî û şaşitiyek bû.

Çawa hin çepgirên kurd "înternasyonalîzma sosyalîzmê" dixwestin, wan jî xwedêgiravî înternasyonalîzma îslamî dixwestin.Weke yên yekem, ew jî di nav şehitiyê de bûn. Wisa be jî, çepgirên kurd pirsa Kurd a netewî kiribûn bername û danîbûn pêşiya çepgirên tirk, ereb û fars. Lê xwedêgiravî Îslamîyên kurd ên nû pirsa netewan li dijî Îslamê û biçûk didîtin. Bi awayekî eşkere, bi dirûşmeyên îslamî, berpirsyariya tirkparêziyê dikirin.

Çepgirên kurd gav bi gav rêya rasteqîn girtin û tekoşîna îro avakirin. Ev encamake diyar e. Ji çepgir û demokratên tirk gellek kesan ji dil piştgiriya doza Kurd kirin, hatin girtin û hinekan jî jiyana xwe ji dest dan. Ango di eniya çepgiran de jihevûdin veqetandin çêbû. Lê li eniyê rastgiran, di ya xwedêgiravî îslamî de, tiştekî wiha pêk nehat.

Baweriya wan bi doza Kurd qet tine bû. Bi awayekî eşkere û misoger dibêjim; ji nîjada Kurd bûn, li ser xaka Kurdan bûn, lê bi bîrdozî, hişmendî, siyaset û tevgera xwe biyanî bûn.

Îro li Tirkiyeyê, bi gotin be jî, yên bi bîrdoziya îslamî tevdigerin êdî desthilat in, dewlet bi xwe ne. Lê çi dikin? Heman polîtîkayên kemalîst, bi heman dezgehan, him jî bi awayekî dijwartir, li himberî gelê kurd dimeşînin. Tehmûla wan ji xutbeyên înê bi kurdî jî tine ye. Ango "di eniya rojava de tiştekî guherî tine ye." Divê di bizava kurdî de, kes û komên ku bi bîrdoziya îslamî tevdigerîn, kumê xwe deynin pêşiya xwe û bersiva bûyerên bûyî bidin:

Li kû derê înternasyonalîzma îslamî heye? Eger hebe, çima hewqas dewletên îslamî hene? Çima hebûna wan li gorî Îslamê ye, lê xwestina dewletbûnê ya Kurdan li dijî Îslamê ye?

Erebistana Siûdî? Erê dewleteke vahabîst e, lê beriya vahabîzmê dewleteka ereb e, hest û tevgera wê ya ewilî erebî ye.

Îran xwedegiravî îslamîst e, lê sedased dewleteke neteweperest a fars e. Em Hizbûllaha Libnanê li ber çavan bigrin, çiqasî piyên wê erd girtin û nêzî desthilatê bû, bernameya xwe ji xwestinên razber ên olî guherte xwestinên rasteqîn ên berbiçav.

Mînaka eşkere Îraq e. Baasî Sunnî bûn. Îro Şiî desthilat in, lê derbara pirsa Kurd de sedased bi heman hişmendiya baasî tevdigerin, tenê dem û şert û mercên demê guherîne, hewqas.

Rast e, hest û baweriya îslamî ya hevpar di herêmê de têkiliyên gelan hêsantir dike. Divê mirov ji bo aştî, lihevkirin û jiholêrakirina neheqiyan jê sûd wergire. Lê Misilmanbûn mafên netewî ji holê ranake. Mînak eşkere ne, di herêmê de netewa ku bi înternasyonalîzma îslamî tevdigere tine ye û qet çênebûye. Ma em Kurd tenê xwelîser in?!

Divê komên bi bîrdoziya îslamî ên kurd werin helwesta rasteqîn û berbiçav. Divê xwestinên wan pêdiviyên gel, ango mafên netewî û demokrasî, bin. Divê li bizava îslamî a tirk hesab bipirsin, wan rexne bikin, tawanên wan ên nîjadperest û zordar bidin rûyên wan. Û tişta çepgirên kurd kirî, divê ew jî bikin û xwe ji îslamiyên tirk ên nîjad û dewletperest cuda bikin.

Divê bibînin ku desthilata îro bi polîtîkaya dewletê ya kevneşop tevdigere. Bedkarî li nirxên îslamî dike. Divê careka din qet nebin leyistoka desthilata tirk. Divê cîh û helwesta xwe eşkere bikin: Kurd in û Kurdistanî ne, an jî biyanî ne?

**Beşa yekê ya nivîsa "Pirsa Kurd, ol û nîjadperestiya desthilat" di hejmara 147ê ya Rûdawê de hatiye weşandin.*

Ax...

Hêmin Ebdulla

Di wê firokeyê de ku ji Qibrisê, piştî yazde salên dûriyê, pê hatime Kurdistanê, du hevrêyên êzîdî ligel min bûn. Yek ji wan jineke mezin xwedî rûyekî nûranî bû, yekî din jî kurekî ciwan yê rûlewitî û tozgirtî bû. Pîrejin ji Amsterdamê ligel min bû û daxwaz kir lê miqate bim, min kurik jî li Qibrisê nas kir. Gava firoke li ser ezmanê Hewlêrê mijûlî daketinê bû, teptepa dilê min xurtir û xurtir dibû. Min pirr dixwest xwe ji ezmanan bavêjim erdê û li benda daketinê nemînim. Min çavên xwe li glop û çirayên şeva Hewlêrê digerandin, lê dûre min kifş kir ku tozbarînê ew ciwaniya Helwêrê ji me veşart.

Pîrejina li tenişta min digot: "Bêhnfireh be kurê min, emê her dakevin." Lê belê kurikê ciwan dikeniya û digot: "Gava tu bigihîje, jê bêzar dibî û lezê dikî, daku careke din vê derê biterikînî." Pîrejin bi dengekî girtî û tije êş digot: "Ti cîh nabin axa mirovî." Kurikê ciwan jî digot: "Ji ber nebûna pereyan hatime û her ku pere bikevin destê min, diçim." Min ji herduyan pirsî: "We ji mêj ve Kurdistan nedîtiye?" Pîrejinê got: "Pir ji mêj ve ye kurê min, saleke." Yê xort jî got: "Na, ne ji mêj ve ye, 5 sal in."

Zêdeyî heftiyekê ye li Kurdistanê me, lê çîroka wê pîrejin û kurikê ciwan dev ji min bernade. Berî 11 salan gava ku min ev welat li pey xwe hişt, xema me ya mezin ew bû ku nedihitşin em ciwan bibin. Yazde salan dûr ji xelk û xaka xwe, min tenahî dît û derdê xerîbiyê jî kişand, her wisa jî poşman nebûm ku min ji Kurdistanê hez kiriye û jê hez dikim. Lê belê di firokeyê de min guhdariya ciwanekî bi hêrs û bêzar dikir ku bi her tiştî difikirî, ji bilî hezkirina welatê xwe.

Ji wextê ku hatime bi ciwanan re me, diçim lîstikgehên sporê, cîhên bêhnvedanê û havîngehan. Cîhê karkirin û dibistan û zanîngehên wan. Kêfxweş im ku tiştê berî 11 salan ji me re li Kurditanê xewn bû, ji bo ciwanên niha misoger û hene, lê zexeliya wan û heznekirina wan ji welatê xwe re min bi hêrs dike.

Mobîlên nûtir û baştir ji yên Ewropayê bi ciwanên vir re hene. Pirraniya wan xwedî otomobîl in. Pere di paşila wan de hene û eger nebin jî dikarin kar bikin û pereyan bidest bînin. Lê belê gava mirov bi wan re dipeyive, bêzar û nerazî ne. Çima? Ji ber ku hest dikin ne azad in. Yekî ji wan ciwanan ji min re digot: "Dizanim tiştê ku li welatê me bidest me dikeve, li ti devera dinyayê nayê destê me, lê li vir ne serbixwe me. Bavê min gotina pêşî û dawî di jiyana min de dike. Lewma bêzar im." Wî ciwanî digot: "Dixwazim herim derve û fêrî jiyana şaristanî bibim." Çend çirkeyan dûre, heman ciwanî, şûşeyeke vala ya avê avête ser caddeyê û keniya!

Ji bo gerê be, yan ji bo kar, çûme gellek welatên Ewropayê. Min gellek cîhên dilber û bêhempa dîtine, lê min ti cîhekî ciwantir ji êvarên derveyî Rewandiz û Soran nedîtine, ku min vê heftiyê dîtin. Girîng e ciwanên me qedrê vê ciwaniyê bizanin û jê hez bikin. Girîng e, eger ji gendeliyê dilgiran in, dilê wan ji nebûna dadmendiyê tije ye, yan ji paşketin û kevneşopiyan bêzar in, şerê nehiştina van kêmasiyan bikin, ne ku zexeliyê bikin û meydanê vala bihêlin.

Rast e, hemû deverên vê cîhanê "erda Xwedê" ne, lê wek wê pîrejina Kurda êzîdî got: "Ti cîh nabin axa mirovî."

www.arsivakurd.org

15 nîşanên penceşêrê ku haya mêran ji wan nîne

Penceşêr roj bi roj zêdetir dibe, wek her nexweşiyeke din çend nîşanên penceşêrê yên taybet hene, lê qet bê test nexweşiya penceşêrê nikare bê diyarkirin.

1 Sîng: Pirraniya mêran têza tûşbûna xwe bi nexweşiya penceşêrê red dikin, ji ber ku ne nexweşiyeke berbelav e, lê dikare rû bide.

Nîşanên wê:

- *Guherîna çerm.*
- *Sorbûn yan qelişîna çermê sîng yan jî (pêsîr)memikan.*
- *Derketina terikandinan di memikan de.*
- *Guherîna mezinahiya memikan.*

2 Azar: Her ku temenê mirov zêde bibe azar jî di deverên cihê yên laşê wî de zêde dibin, dibe ku hinek azarên bê sedem jî nîşanên penceşêrê bin.

3 Guherîna di gunikan de: Pêwîst e têbîniya her avisbûn yan guherîneke di mezinahiya gunikan de bê kirin, kîsê gunikan jî divê bê çavdêrîkirin.

4 Guherîn di lîfên girêkan de: Her guherîneke wek kulbûna binçengê yan her cihekî din, nemaze jî ger werimînek hebe di lîfên girêkan de û zêdeyî mehekê dirêj kir pêwîst e serdana doktor bê kirin.

5 Ta girtin yan germbûna laş: Tayeke bê navber dibe ku nîşanek be ji nîşanên derketina penceşêrê. Pirraniya cureyên penceşêrê di qonaxekê de dibin sedemê bilindkirina pileya germiya laş.

6 Kêmkirina giraniya laş: Daketina giraniya laş nemaze ger ji nişka ve bû, eger kesekî di hundirê 3 mehan de ji sedî 10ê giraniya laşê xwe ji dest da, divê serdana doktor bike.

7 Kuxîna berdewam: Normal e kesek ji ber cureyê karê xwe yan nexweşiyeke yan ji ber bandora dermanekî yan xwarineke bikuxe, lê ger kuxîn ji 4 heftiyan zêdetir bû, divê serdana doktor bê kirin.

8 Xemgînî û êşa zik: Pêwîst e serdana doktor bê kirin ger êşeke zêde di zikê kesekî de hebe û hevdem xemgînî jî pê re hebe, ji ber ku pêwendiyeke bihêz di navbera xemgînî û penceşêra pankreas de heye.

9 Qurpandina xwarinê: Hinek kes nikarin bi hêsanî xwarinê biqurpînin, ji ber ku cureyê xwarina xwe diguherin, lê ger demdirêj bû pêwîst e serdana doktor bê kirin.

10 Kêşeyên mîzkirinê: Bi zêdebûna temen re çend kêşe di mîzkirinê de derdikevin, wek hestkirina bi vala nebûna mîzdankê, mîzkirineke ne asayî, di van rewşan de divê serdana doktor bê kirin.

11 Çerm: Di dema guherîna rengê çerm de, yan hatina xwînê bi berdewamî ji çerm, pêwîst e serdana doktor bê kirin.

12 Guherîn di nava dev de: Nemaze çixarekêş ger pelqên spî li ser ziman yan di nav devên wan de bên dîtin, divê lêkolînê di vî alî de bikin, dibe ku nîşanên destpêkê yên penceşêra dev bin.

13 Hebûna xwînê di hinek rewan de ku nabe hebe: Wek derketina xwînê bi kuxînê re, yan di nav mîzê de, yan li gel pîsatiyê.

14 Betilîna berdewam: Bi berdewam hestkirina bi westiyanê ji bo demeke dirêj û piştî bêhnvedanê jî, dibe ku nîşaneke penceşêra kolon be.

15 Giraniya di cûtina xwarinê de: Dibe ku nîşaneke penceşêrê be. Dema derket û dirêj kir, divê serdana doktor bê kirin.

Xaçepirs

Çeperast: 1-Darvan, kesê diçe daran, bi darê ve girêdayî – Agir, heya, namûs – Nexweşîya şekir. 2- Net, vekirî, zelal (berepaş) – Lêkirin, şênkirin, xweşkirin. 3- Li bakurê Kurdistanê çiyayek (berepaş) – Layiq, hêja, pê dikeve, lê tê (berepaş) – Li Tirkiyê bajarek. 4- Zarokên mîhê (berepaş) – Bi Erebî "na" (berepaş) – Kevneşopî ye, tore ye, normal e. 5- Bi xwe re birin, bê destûr stendin, girtin û bazdan. 6- Rêxistina leşkerî ya girêdayî Adolf Hîtler, artêşa Nazîyan – Meyxaneya bi muzîk, meyxaneya Yewnanîyan. 7- Ne hişk, ne ziwa, nerm – Nexê zirav, pê cil tên dirûtin – Ezezî, xweperestî. 8- Pêveka pronavan – Cil û bergek jinan, cil û bergê dirêj. 9- Cahil, xeşîm, naşî, nedîtî – Bi Soranî "çi". 10- Tewabûn, xilasbûn, nema.

Serejêr: 1- Derkirin, berdan. 2- Meha Newrozê – Belgenameya garantî û ewlekarîyê. 3- Raser, himber, miqabil – Çêbû, hat dinyayê. 4- Li hedefê xistin, pêvedan – Xam, nezan, nermik. 5- Erk, wezîfe, bar. 6- Xwarina ji genimê hûrkirî, girar. 7- Şên, lêkirî – Na, nexêr – Dewlemend û xwedîyê gund. 8- Bêaqil, kesê wek dewaran (berepaş). 9- Di derpî, şerwal û pantalonan de ciyê ku lingê meriv dikevê – Pirsek. 10- Hacetek sotemenîyê, fêkî li wan dikevin – Navek jinên Ewrûpî. 11- Roja xutbê. 12- Di dîrokê de dewletek Kurd. 13- Kanî, bîne, teslîm bike. 14- Tax, mehelle (berepaş). 15- Xilas bû, nemaye. 16- Nexêr, nabe, naxwazim.



Mezopotamya
Weqfa Şandina Cenazeyan

Mezopotamya canazeyên we dişîne herçar beşên Kurdistanê

Di rojên dijwar de em bi we re ne

Tel.: 02331 - 47 33 886
Mobil: 0178 - 18 56 970
0172 - 27 24 163

Navnîşan: Frankstr. 6 • 58135 Hagen/Almanya
E-Mail: sigortaci-alp@hotmail.de
www.mezopotamya-cenazefonu.com

www.ajdivakurd.org

Rojbûn an jî şahiya te ye û tu jî dixwazî wêneyê xwe li vir bibînî? Ji me re bişîn: info@rudaw.eu

Rêzan û Huzan cêwî ne

Rêzan û Huzan cêwî ne û ew 01.08.2001 li bajarê Zaxoyê, li başûrê Kurdistanê ji dayîk bûne. Ew yek-sali ji Zaxoyê derketine û niha li Almanyayê, li bajarê Mannheimê dijîn û diçin polê 4ê. Rêzan û Huzan bi zimanê almanî baş dizanin û hevalên wan yên alman jî gellek hene, lê wan zimanê dayîkê kurdî jî ji bîr nekirine û kurdî jî baş dizanin. Huzan ji muzîka almanî û ya kurdî pirr hez dike û ji dengê Ebdulqehar Zaxoyî hez dike, bi taybetî ji strana "Tu naçî ji bîra min". Huzan dixwaze di pêşerojê de bibe doktora diranan. Rêzan jî zêde ji futbolê hez dike û ji bilî wê jî li dibistanê pirr jîr e, bi taybetî ji dersên matematîkê û zimanê almanî hez dike. Huzan jî xwedî hobbyekî taybet e, ew ji basketbolê hez dike û dileyîze.

Rast an derew?

Te di wê bîrê de çi dikir?
- 30 sal berê saeta bavê min ketibû vê bîrê, min jî îro derxist. Ti tiştek pê nehatîye, her wekî agir kar dike!
- Îcar ew çi ye! Ê min, bavê min 30 sal berê ketibû vê bîrê, me derxist hêjî sax bû!
-Wow wow, çi derew!
- Na, ne derew e. Ji ber ku bavê min di bîrê de saeta bavê te eyar dikir!

Razan bo min pêwîst nake! An?

Weke xwarinê, xew jî ji bona çalakbûna laşê me tiştekî pêwîst e. Ji bona sîstema sinira xew çavkaniya hêz û enerjiyê ye. Nexewkirin anjî kêmxewkirin refleksên me sist dike. Ji ber vê yekê kesên kêmxew hîn bêtir bûyerên qezayên trafîkê derbas dikin. Xeweke baş dibe sedema ku hemû beşên laşê me karibin karê xwe baş bikin.

Herçiqasî em di xew de bi gellek tiştan nahesin, lê xewkirin jî karekî çalak e. Di dema xewê de hereketên çavên me vê yekê diyar dikin. Ji bona ku em bizanîn xew çiqasî bo me giring e, şevek bêxew vê yekê tîne bîra me, bi sistbûna laşê me û kêmhezkirina me bo her karekî.

Tiştanok

Ji şekir şîrîntir e.
Ji hesin girantir e.
Ew çi ye?

Bersiv: Xew

Amedekirina rûpela zarokan: Sevda Şafîk

www.arsivakurd.org